




Deng bilind bibe

Dilan Yeşilyaprak muzikjeneke ciwan e û têkildarî hunera xwe wiha got: "Heta ku ji destê min bê ez ê piştgiriye bidim perwerdehiya jinan. Ku em di her qadê de bi ser bikişevîn, dengê me dê bilind bibe û ev newekhevî ji holê rabe."... RÛPEL - 2



Teşe bi dijital derket

Hejmara yekemîn a kovara sînemaya kurdî Teşe, derçû. Kovar dê sê mehan carekê bê weşandin. Tevahiya wê jî li ser malpera wê ya înternetê bi awayê PDF'ê dikare bê peyda kirin. Xwedî û berpirsyarên kovarê Mehmûd Beyto û Cihan Ülûs in... RÛPEL - 11



Hejmara nû ya Zendê

Kovara lêkolîn û zanistî Zend cara 27'an gihîşt xwînerên xwe. Zend ku wekî weşana Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê ye bi naverokeke nû çap bû. Di vê hejmarê de Tahir Baykuşak li ser "Rola Hacî Qadirê Koyî di Avakirina Fikra Nete-werweriya kurdî de" nivîsiye... RÛPEL - 11

Rojnameya Heftane

www.xwebun.org

xwebûn

13 - 19 Tîrmeh 2020

Hejmar: 30

Buha: 4 TL

rojname@xwebun.org

DEDAŞ'ê gel perîşan kir

Li gundên navçeyên Dêrik û Qoserê yên Mêrdînê ji 16'ê gulanê ve bi hinceta ku deynê gundiyan hene, cebran hatiye birin. Bi birîna cebranê re av jî li gundiyan hatiye qutkirin. Vê yekê jî li gundan encamên gelek giran bi xwe re anîne. Ji ber ku havînê avên çem û newalan jî ziwa bûne, sewalên li van gundan nikarin xwe bigihînin avê û ji tîna dimirin. Gel perîşan bûye...

RÛPEL - 3

Bilbilê Amedê dengê zindî yê dîrokê bû

Dengbêj Seyîdxanê Boyaxçî di 5'ê tîrmehê de li Amedê çû ber dilovaniya xwe. Seydo Şimşek di nav gel de wekî Xalê Seyîdxanê Boyaxçî û her wiha Bilbilê Amedê dihat nasîn. Cenazeyê Seyîdxanê Boyaxçî li goristana Yenikoya Amedê hat veşartin. Bi salan dengê Seyîdxanê Boyaxçî li kolanên Amedê olan da û Bilbilê

Amedê koça dawîn kir. Wî eş û kederên xwe bi dengbêjiyê anî ziman. Hunermend Farqîn got ku wekî dîroknasekî dengbêjiyê bû û dê ciwan li keda wî xwedî derkevin û stranên wî bibêjin. Lêkolînerê muzîkê Veysî Varli da zanîn ku di warê derûniya dengbêjiyê de Seyîdxanê Boyaxçî gelekî pêşketî bû... RÛPEL - 8



Qalîkê li ser birînê

Îhaleya qirkirinê

Li 8 herêmên Dêrsimê ji bo neçîrkirina 17 pezkoviyên îhale hat kirin. Di sala di 2019'an de jî hem bi destûra dewletê, hem jî bêyî destûra dewletê gelek pezkovî hatibûn neçîrkirin. Ev jî bûbû sedema bertekan û li bajêr ji bo qedexekirina neçîrê kampanyaya înzeyê hatibû destpêkirin. Di encama van bertekan de bi înzeya waliyê Dêrsimê Tûncay Sonel, hemû xebatên neçîrê yên li bajêr hatibûn qedexekirin... RÛPEL - 3




Ev demek e peyva 'nifşa nû' û nîqaşên di vê derbarê de bûne mijarên gelek nivîs, gotar û lêkolînan. Nifşa Z hem ji hêla hişmendiyê hem jî ji hêla xemilandina xwe ve, ji nifşên beriya xwe bi gelek awayan cudatir e. Çend hefte berê hemû George Floyd bûn, an jî wek Las Tesis jinên li hemberî tecawizkeran bûn. Nifşa Z xwe bi netewe, ziman, reng, zayend û olan pênase nake, lê wek qalîkê li ser birînê ye; xwîn ji ku biherike, wek şaneyê xwe lê digire. ...

Munewer Azîzoglu Bazan / RÛPEL - 2

Karekî zanistî

Ji aliyê Zanîngeha Sorbonê beşa Înalcoyê ve ji bo kurdî/kurmancî rêbazêke nû hat ceribandin. Bi rêya ZOOM'ê li ser înternetê xebateke berfireh di van rojên koronayê de pêk hat. Ev bernameyêke têr û tijî bû. Kesên li vir ders dan, ji zanîngehên navdar ên welatên cur bi cur bûn. Helbet tişta ev mamoste anîn cem hev kurdî bû. Pêşkêşiyên hemû mamosteyan bi zîmanekî zanistî û bi rêk û pêk bûn... Hisên Çatikkaş / R.7



Ez Omedya

Namey mi Omedya ya. Wexto şîma fotografê mi vîna ez des rocî biya. Erê, erê, ez rast vana, ez tenî des rocî biya. Egir wextê şîma zî bibo ez şîma rê qalê deh rocanê xo bikerî. Wexto ez amiya dinya kêfê dadî û babê mi ame... Cemil Oguz / R.9

Mal kaniyên folklorê ne

Hejmara 6'ê emîn a kovara Folklorame hat çapkirin. Di vê hejmarê de 23 nivîsên analîz, berhevkarî, danasîn û lêkolînan li ser folklorê hene. Kovar tevî nivîsên xwe, bi rengîniya wêneyên xwe jî balê dikişîne. Edîtorê kovarê Eşref Keydanî destnîşan kir ku li bakurê Kurdistanê ji aliyê berhevkarîya folklorê ve, hişyariyek baş heye û wiha got: "Ji aliyê berhevkarîyê ve sînorên me tune ne. Malên kurdan wek kaniyên folklorê ne... RÛPEL - 11

Hemû fîlozofiya jiyane di dinyaya wan jinan de hebû

Berhevkar û lêkolînera çanda kurdî Zeyneb Yaş pirsên rojnameya me bersivandin û wiha got: "Min dema ku berhevkarî ji wan jinan dikir, min dît ku ew xwe xwediyê çandeke devekî ya ku heta vê gavê nehate nivîsandin ku ne tenê kurd lê dinya tev jê bêpar maye. Hemû fîlozofiya jiyane di dinyaya wan de hebû..."

Hevpeyvîna Rizoyê Xerzî / R.4



Bertekên li hemberî êrişê zêde dibin...

RÛPEL - 6

Rêya ku jin xwe pê didin fêhmkirin

Bêrivan Kayi

Dilan Yeşilyaprak muzikjêneke ciwan e û di 12 saliya xwe de bi bandora hevalên xwe yê elewî dest bi tembûrê dîke. Piştê li Zanîngeha Stenbolê beşa konservatuarê dest bi dersên perkusyonê (rîtim) dîke û ev 8 sal in ku bi awayekî profesyonel dixebite. Wekî gelek kurdên ji welatê xwe dûrketî malbata Yeşilyaprak ji ji Mêrdînê koçî Îzmîrê dîke û ew li wir mezin dibe. Her çiqas ku ji çanda xwe dûrketibin ji ew di axaftina xwe ya zimanê dayikê de israr dîke û bi van hestên xwe dest bi muzîkê dîke û niha mamosteya rîtimê ye û bi gelek hunermendan re derketiye ser dikê.

Yeşilyaprak der barê muzîkjeniya xwe de axivî û diyar kir ku ji ber perkusyon bi lêxistin û dengê bilind tî bikaranîn wekî 'enstrûmanên mêran' angî qadeke mêran hatiye binavkirin.

Perkûsyon tenê ne ya mêran e

Yeşilyaprak beriya 8 salan dema dest bi rîtimê dîke bi nêzikatiyeke ku perkusyon wekî sîmgeya 'hêz'ê angî 'jêhatî' bûnê ye dest pê dîke û wiha dibêje: "Kesên perkusyonîst ji derve pir bi hêz xuya dikin. Ji bo ku lêdan, tundî, bihêzbûn û bi dengê bilind axivîn wek taybetmendiyên mêran dihat hesabandin, min ji xwest wek wan xuya bikim û hêza xwe ji lêxistinê bigirim. Lê piştê min ferq kir ku ji aliyê mêran ve hêz ji destê jinan hatiye girtin."

Yeşilyaprak li ser erbanê û gelek cureyên enstrumanan jî dixebite. Dilanê di axaftina xwe de bal kişand

"Li gorî min huner rêyeke ku jin xwe pê didin fêhmkirin û ez jî bi rîtmê li ser vê rêyê dimeşim. Heta ku ji destê min bê ez ê piştgirî bidim perwerdeya jinan. Ku em di her qadê de bi ser bikevin, dengê me dê bilind bibe û ev newekhevî ji holê rabe"

ser bandora enstrûmanên rîtmê ya di çanda kurdan de û wiha got: "Jixwe di çanda kurdan de jin tim bi rîtimê re mijûl bûne. Li rojhilatê Kurdistanê gelek jinên rîtimjen hene. Piranî li defê/erbaneyê didin. Ez bi hemû perkusyonan ve mijûl im."

Atolyeya ji bo jinan

Di axaftina xwe de Yeşilyaprak bal kişand ser tundiya li ser jinan û qala xebatên xwe yê ku tenê ji bo pêşketina jinê destpêkirî, kir.

Yeşilyaprak diyar kir ku hewce ye enstrûmanên rîtmê êdî tenê ne wek karekî mêran were hesabandin û wiha domand: "Ez dixwazim rîtimjeniyê belav bikim bi taybetî di nav jinên kurd de. Mixabin jin jî dûrî rîtimê disekin jin ji bo ku lêdan wek karê mêran tê hesabandin. Dixwazim vê nêrîna şaş

biguherînim. Ji bo vê xeyalê, min gaweke jî avêt. Li Taksîmê atolyeyek heye, li wir tenê ji bo jinan dersên rîtmê didim. Dixwazim agahiyên xwe bi wan re parve bikim û hejmarê jinên rîtimjen zêde bikim û vî karî ji destê mêran derxim."

Ji bo jinan perwerdeya rîtmê

Yeşilyaprak wek jineke kurd ji festîvala cazzê heta komeke amerîkî ji wir jî bi gelek hunermendên kurd re derketiye ser dikê. Ew her roj bi saetan kedê dide karê rîtimjeniyê û heta carinan ji bo ku tiliyên xwe bihêz bike ceribandî li ser keviran jî dîke. Têkildarî zehmetiyên ku ew wek jinekê dikişîne ji Yeşilyaprak ev tişt anî ziman: "Jinbûn li hemû dinyayê û di her qadê de pir zêde zor e. Min pir tehde dît heta ku min xwe wek muzikjênekê da qe-

bûlkirin. Ji ber ku nêrînen mêranî, tenê laşê min didîtin û bawer nedikirin ku dê jinek di muzîkê de ser bikeve. Bi dewlet an jî bêdewlet ferq nake, xwedî zayenda jinbûn an jî kesên ku xwe wek jin didin nasîn zehmet e. Li gorî min huner rêyeke ku jin xwe pê didin fêhmkirin û ez jî bi rîtimê li ser vê rêyê dimeşim.

Heta ku ji destê min bê ez ê piştgirî bidim perwerdeya jinan. Da ku em di her qadê de ser bikevin."

Perkusyonîst Yeşilyaprak bi salan e bi karê muzîkê ve eleqadar e û di dema koronayê de jî bi onlîne dersên rîtmê dane. Yeşilyaprak da zanîn ku hem ji bo muzîkê hem ji bo gelek qadên din hewce ye êdî her kes li ser dijitalê hunera xwe parve bike û her wiha neşopandina kurdan a kanalên kurdî yê li ser medyaya civakî jî rexne kir.



Biyar

Munewer Azizoglu Bazan

Nifşa Z, qalikê li ser birînê

Ev demeke dirêj e, bi taybetî bi derketina çalakvana ekolojîst Greta Thunberg, peyva 'nifşa nû' û niqaşên di vê der barê de bûn mijarên gelek nivîs, gotar û lêkolinan. Nifşa nû ya ku wek 'nifşa Z' jî tê binavkirin, li Tirkîyeyê di hefteya borî de bi mebesta civîna Erdogan a bi ciwanan re li ser medyaya civakî, bû mijara sereke. Hin kesan ew pîroz kir, hin kesan li ser teşeya protestoya wan, ew analiz kirin; hin kesan li ser ciwanan wek dengdarên potansiyel propagandayê xwe kirin. Hin kesan pêşeroja xwe bi wan ve girêdan û hwd.

Nifşan li gorî taybetiyên wan ên demî û civakî û bi taybetî girêdayî pêşketinê teknolojîk jî hevûdu veqetandin, yek ji rêbazên civaknasiya nûjen e. Ji bo pênasekirin û fêmkirina fenomenan kategorîzekirinê wek rêyeke sereke bi kar tîne û bi vî awayî dixwaze hevkarî û cudahiyan fenomenên civakî jî hevûdin derxîne. Ev çiqas pêwîst e û çiqas li gorî berjewendiyên mirovahiyê tê bikaranîn pirsên sereke ne. Lewre em dizanin ku ev rêbaza kategorîzekirinê mirovahiyê û civakan li gorî 'nijad', reng, çand, ziman û zayendan jî hev veqetandine û bi vî awayî bingeh ji hiyerrarşî, nijadperestî û çinan re amade kiriye. Lê bila ev tespît tenê wek aga-hiyeke nav kevanê li vir bimîne. Ez ê di sa vegirim ser mijara 'nifşa Z'.

Cara yekemîn nivîskariya kanadî

Douglas Coupland di pirtûka xwe ya bi navê 'Generation X – tales for an accelerated culture' (1991) de nişkeke bi tîpên latînî bi nav dîke. Piştî derketina vê pirtûkê ev peyv di nav literatura civaknasiyê de rûnişt û nişên li dû wê di sa bi mantiqa tîpên latînî hatin binavkirin (Nifşên Y û Z). Angî niha piştî 'nifşa Z' nişên 'Alpha û Beta' li pêşberî me ne. Bi giştî di nav civakan de niş li gorî hin taybetmendiyên xwe yê balkêş tîpên ravekirin. Û ev pênasekirin her tim ne erênî ne, heta nakokiya nişan derdixîne der. Mînak; gotinên wek 'zarokên biskuvîtan' 'ciwanên iphonê', 'nişên tirêmbêlan/balafirên' balê dikişînin ser hin taybetmendiyên nişan. Li gorî vê kategorîzekirinê kesên di navbera 1965-1980 de hatine dinê endamên 'nifşên X' ne, yê di navbera 1980-2000'an de endamên 'nifşên Y' ne û yê di navbera 2000 û 2020'an de dikevin nav kategoriya 'nifşên Z'. Her çiqas zanist di vê binavkirin û kategorîzekirinê de hîn ne yekdengî be û bi şik nêzik bibe jî, ji aliyê din ve tespita ku di-

bêje di navbera komên temenên cuda de ferq û meylên cuda hene, dipejirîne. Ya din dabeşeke zelal di navbera nişan de ne mumkun e, di navbera wan de veguhestineke zindî heye. Her wiha divê mirov van taybetmendiyên weke ya giştî bibîne, lê neke rêbazên neguherbar û nekeve xetereya endezariya civakî.

Li gorî vê dabeşiyê tê gotin ku nifşa Z hem ji hêla hişmendiyê hem jî ji hêla xemilandina xwe ve ji nişên beriya xwe bi gelek awayan cudatir e. Nîrx û watedariyên nişên beriya wan bo wan bê mane ne: netew, zayend, ol, reng, nijad û hwd. Ya rastî ne bêwate ne, lê wateyên nû digirin. Li dijî dubendiyan in. Ne tenê durûtiya pergalê di heman demê de yê dê û bavên xwe rexne dikin. Nifşa 'azadixwaz' a beriya wan ku bawer dikir ekolojî, mafê mirovan û wekhevî bi rêya 'alîkariyê' dê bidest bixin, tenê kevirên ku diçe rêya cehennemê dirûstîr kirin. Ji wê demê de çî baştir bû: nijadperestî, pêkutî, tundî, hawirdor? Hemî ji her ku çû xirabtir bûn. Lewre 'azadixwaz' bi konformîzma

demê hatibû dorpeçkirin.

Çend roj berê ez çûm deverekê. Dema min kir ku ez li ser kursiyê rûnem, nivîseke tam li hemberî min bala min kişand. Li ser qasnaxekî hevokeke hema bêje di wateya 'nasnameya te ya neteweyî serê te bixwe' hatibû nivîsandin. Ez di nav xelil û celîlî de mam. Ji hêlekê ve min got 'hedê kê ye nasnameya min wisa bike mijara pirsê. Ez rabim herim.' Ji aliyê din ve ez li benda çend ciwanan bûm, diviyabû me çalakiyeke ji bo jinên li Kobanê ji hêla dewleta tirk ve hatin kuştin birêxistin bikira. Van ciwanan ez wek jineke kurd pêşwazî kirim. Angî ez bi nasnameya xwe ya neteweyî û zayendî bi wan re bûm. Lê ez nizanim yê li hemberî min çibûn? Jin, mêt, queer, trans, alman, reşik, ispanyol, faris, ciwan, navsere, ewropî, afrikî, xwendekar, karker? Xwe çawa pênase dikirin? Min ferq kir ku ez li gorî têgihîştina xwe û ji bo ewlehiya xwe li dû kategorîzekirina wan im. Lê ew bi alên xwe yê YPJ'ê li hemberî min rûniştî, li ser plansaziye fikrên xwe dianîn ziman. Wê keliyê tev kurd bûn, jinên li Kobanê bûn. Wekî ku çend hefte berê hemî George Floyd bûn, an jî wek Las Tesis jinên li hemberî tecawizkeran bûn. Nifşa Z xwe bi netewe, ziman, reng, zayend û olan pênase nake lê wek qalika li ser birînê ye; xwîn ji ku biherike, wek şane xwe lê digire.

Di van rojên nediyar de...

Mizgin Ronak

Di van rojên karantînayê de dixwazim bi helbestekê li deriyê we bixim û "gomlegêk" diyarî we bikim:

"Tu gomlegê min î te li xwe dikim her sibeh çavên zarokatîyê destên baranê dengê avê axîna yasemînê yeko yeko dibînim dibihîsim her tişt di olana havîneke ku her kes tê de winda ye de ye mayîn diteqîn li sinorên hebûnê heçecik lîs dibînin çîmen stranên dibêjin toza stêrkan difire tofan e her tişt, Kurdistan e rê jî rêvî dirêjtir e."

Wê payîza dîr tê bîra min. Payîz bû, çûbûm bajarekî me yê çiyayî û xweş lê bajar bêhuzûr bû, diqilqilî lewre gomlegê (Erê gomleg!) digeriya û bi rûyê xwe yê bi rûpoşa faşîstan maskekirî nedixwiya lê tev li operasyonan dibû û bi dehan kes dabûn girtin. Îja ya ecêbê de û bav, zarok û xwişk û bira ji hev diketin şikê û ji hev re digotin "dê diya min, bavê min bişopîne, jê ketiye şikê" digotin "belkî gomlek tu yî!"

Payîza wî bajarê me yê zaza bi 'gomlegê' xayîn perîşan bûbû. Loma divê "gomlegê mirov hebe û baş be, xweş be. Îja vê gomleghelbestê (an jî helbestgomlegê) loma wiha hat nivîsandin. Di cihê de wekî Kurdistanê, derdas dibe lê Xwedê dizane ku çî ye?

Dema hûn bixwînin dê her yek ji we, wê jî nû ve binivîsîne û bide jiyîn. Xwedawend dizanin ku dê ew gav çî wateyan li xwe peyda bike. Hûn dikarin vêya wekî emanetek jî bixwînin lewre min ew jî mexzena qarantînayê nivîsand û mexzen ne cihêki bi ewle ye. Ji bo ku tîrba bi saxî ye dibe ku mirov jê sax nefilite jî. Loma vî gomlegê wekî xatirxwestin û tembîhnameyek wek daxwaz û xewna paşin jî bibînin. Çimkî diyar nîn e ku dê kî jî me kinga û çawa biçê bi taybetî jî yê li mexzenên wiha ne. Mînak; faşîst jî vê rastiyê qebûl dikin. Çendek berê min jî serbazê dagirker re got ku cihê me nebaş e; got: "Em di eynî keştiyê de ne Mizgin!" Lê dema ku min got "Na, ne eynî keştî ye em di mexzena mexzenê de ne"! hiş bû û çû. Heger neçûya, belkî gotin dirêj bûbûya dê bigota; "Tabî hûn di mexzenê de ne lewre hûn, kurd, têkoşer û berxwedêr in!"

Ecêb e ne? Diz û xwediyên malê zûde bi hev hesiyane lê film naqede dirêj û dirêj dibe. Tenê koronayê ferqa mexzen û guwerteyê, ya serdest û bindestan jî holê rakir. Ji ber ku xweza dadwêr e; ku wekî koronayê bi çavan neyê ditin jî çavên wê dibînin û her derê dide ber xwe. Yanî, li gorî daxwaza faşîstan nake tenê hinekan nake qurban...

Tam di vir de wekî kêmasiyek di ezmûna koronayê de ev hatin bîra min; di van rojên ku dewlet tîra xwe deşifre bûne de hê jî mirov bêje; "Bila dewlet tevdiran bigire, bila dewlet sinoran deyne û hwd. şaş e. Dewlet jî ber ku dijmin e, dixwaze ev karesat bibe fersend û jî hezaran kurdan xilas bibe. Çî jî destên wê tê dîke. Îja em çawa û çima hê jî bendewar in? Jixwe ev karesat jî hêla hêz û zanîna kes, civak û welatan ve jî azmûn e ne?

Bi hêviya gomlegên xweş û azmûnên baş...

DEDAŞ sewalan dikuje û çandiniyê tune dike

Li beriya Mêrdînê, DEDAŞ'ê ji meha gulanê ve bi hinceta deyn ceyran biriye. Bi ceyranê re av jî li beriyê qut bûye û gelek sewal ji tîna mirine. Gundiyar diyar kir ku DEDAŞ çandiniyê diqedîne û sewalên wan dikuje

Navenda Nûçeyan

Li gundên navçeyên Dêrik û Qoserê yên Mêrdînê ji 16'ê gulanê ve bi hinceta ku deynê gundiyan hene, ceyran hatiye birin. Bi birina ceyranê re av jî li gundiyan hatiye qutkirin. Vê yekê jî li gundan encamên gelek giran bi xwe re anîne. Ji ber havîne avên çem û newalan jî ziwa bûne û sewalên li van gundan nikarin xwe bigihînin avê û ji tîna dimirin. Gundiyarên ku ceyran û ava wan hatine birin, ji rojnameya me re axivîn û qala rewşa xwe ya tê de ne kirin.

Keyayê gundê Selmê yê navçeya Dêrikê Sultan Arda, diyar kir ku Şirketa Anonîm a Belavkirina Ceyranê ya Dicleyê (DEDAŞ) bi



hinceta ku deynê wan heye, ceyrana wan birine û wiha got: "DEDAŞ'ê ceyrana xeta avê qut kiriye. Li ser xeta ku ceyrana wê hatiye birin 100 bir hene. Dibêjin heta ku hemû xwediyên biran deynê xwe nedin dê ceyranê bernedin. Ji ber ku fatore gelek giran in kes nikare deynê xwe bide. Fatoreyên ku ji gundiyan re hatine gundî garisê

xwe hemû bifiroş in jî nikarin razînin. Li gelek gundan qurta ava vexwarinê nemaye, sewalên gundiyan jî tîna dimirin. Gel perîşan bûye."

75 hezar TL fatore birine

Ji heman gundî cotkar Hasan Taşkiran jî destnîşan kir ku 75 hezar TL deynê ceyranê jê re hatiye û ceyrana wî hatiye birin û derbarê

rewşa xwe de ev tişt anî ziman: "Ji ber deynê DEDAŞ'ê me îsal erdên xwe yê garis vala hişt. Ka gundî van fatorayên ku ewqas zêde biha hatine wê çawa bidin? Fatoreya min tenê 75 hezar TL hatiye. Ez îsal çandina garis bikim jî vala ye, jixwe perên ji wan garisan werin jî encex tîra fatoreyên av û ceyranê bike."

Sewal ji tîna dimirin

Ji gundê Menteşiyê Hemdiye Aksoy, da zanîn ku ceyrana gundê wan ji 16'ê gulanê ve hatiye birin û bi van gotinan qala rewşa ku tê de ne kir: "Ji rojîyê ve ceyran û ava me tune ye. Em rezîl bûn, heywanên me mirin. Em jî bo vexwarinê avê ji gundên din tînin. Em sibê heta êvarê avê li ser milan dikîşînin. Ev du meh in hê me wêki mirovan serê xwe û cilên xwe neşuştine. Me tankêra avê jî kirî lê disa jî tîra tu tiştî nake. Gelo bê av em ê çawa xwe ji nexweşiya koronayê biparêzin?"

Beyî binêrin fatoreyan dibirin

Sultan Aksoy jî bi lêv kir ku li gundê Menteşiyê nêzî 10 hezar pez heye û der barê zehmetiya ji ber birina ceyranê û tunebûna avê dikîşînin ev tişt got: "Ji bo pezê xwe em avê bi neqlan û tankêran ji çolan tînin. Dewletê Serêkaniyê kir qada cotkariyê lê yên me ne wisa ne. Fatoreyên wan tî 3 hezar TL ên me tî 30 hezar TL. Em vê nêzîkatiya siyasî qebûl dikin. Bîreke birayê min heye, 2 sal in nehatine lê nenîhêrîne lê trîlyonek fatore birine."

Rûyê nû yê Heskîfê av û beton e

Navenda Nûçeyan

Bendava Ilisûyê ku demeke dirêj bû xebatên çêkirina wê berdewam dikirin, sala borî xebatên wê bi dawî bûn û di mehên havînê de devên wê hatin girtin. Bi girtina devê wê ava çemê Dicleyê roj bi roj lê pêngar da û bi dehan gund di bin xwe de hişt. Li gel hemû bertek û daxwazan jî bilindahiya diwarên bendavê nehat kêmkirin. Ji ber vê sedemê navçeya Heskîfê ya Êlihê ku xwedî dîroka 12 hezar salan bû jî bi temamî di bin ava bendavê de ma.

Ji bo niştecihên navçeyê, bi çend kilometreyan dûrî bajarê Heskîfê ku niha di bin avê de maye, bajarekî nû hat avakirin. Hin berhemên dîrokî bi pereyekî mezin ji bo bajarê nû hatin veguhastin. Li dijî gelek berhemên jî talankeriyê mezin pêk hat. Di bin navê turîzma avê de derdora wan hat betonkirin û li bendê ye ji bo van deveran seferên kelekan bîn destpêkirin.



Talan pesinand

Di nav hefteyê de ji aliyê Ajansa Anadolûyê ya dewletê ve talana ku li dijî navçeyê û dîroka wê pêk hatiye, hat pesinandin. Ajansê bi ser navê "Heskîf bi rûyê xwe yê nû li benda mêvanên xwe ye" nûçeyek servîs kir û xwest ku mirov biçin serdana Heskîfê. Lê rûyê ku Ajansa Anadolûyê gel vedixwîne tenê av û beton e.

AA şermezar kirin

Ev banga ajansê rastî gelek bertekên tund hat. Partiyên muxalefetê bi daxuyaniyan ev bang şermezar kir û destnîşan kirin ku ji ber ku Heskîf li holê nameya tu wateya bangê nîne. Disa gelek kesên navdar jî der barê mijarê de daxuyanî dan û bertek nîşanî berovajîkirina rewşa Heskîfê ya ku ji aliyê Ajansa Anadolûyê ve hatiye kirin, dan.

Şaredarê AKP'ê jî xemgîn e!

Şaredarê Heskîfê yê AKP'î Abdûlvahab Kûsen jî piştî servîskirina nûçeyê bi rêya qanaleke televîzyonê der barê mijarê de daxuyanî da. Şaredar Kûsen, bi awayekî sosret weke ku qet piştgirî nedabe çêkirina bendavê got ku ew bixwe jî ji ber ku Heskîf di bin avê de maye xemgîn e û lê tiştê ku bike nemaye.

Navê îşkenceyê kirin mudaxaleya bikontrol

Aktîvîsta Teverga Jinên Azad (TJA) Sevîl Rojbîn Çetîn, roja ku bi ser avahiya Kongreya Civaka Demokratîk (KCD) hatibû girtin, bi fermana Serdozgeriya Komarê ya Mêrdînê bi ser mala wê de jî hatibû girtin. Polîsan, li malê bi kûçikan îşkenceyê giran li Çetîn kiribûn û ew binçav kiribûn. Îşkenceya ku li Çetîn hatibû kirin, ji aliyê parêzerên wê ve hatibû belgekirin.

Ji bo ku şopên îşkenceya li Çetîn hatibû kirin bîn windakirin, 3 caran dema binçavkirina wê hat dirêjkirin û 12 rojan di bin çavan de ma. Piştî binçavkirina 12 rojan di nav hefteyê de Çetîn derket dadgehê û bi sîwdariya "Endamtiya rêxistinê" hat girtin. Îşkence û girtina Çetîn di nav civakê de bû sedema bertekan. Gelek saziyên jinan bi daxuyaniyan bertek nîşanî girtina Çetîn da.

Li gel bertekên ku hatin nîşandan jî rayedarên AKP'ê îşkenceya ku ji aliyê polîsan ve li Çetîn hatibû kirin parastin. Rayedarên AKP'ê angaşt kirin ku Çetîn li dijî polîsan derketiye û ji ber vê yekê bi awayekî bikontrol mudaxaleyî wê hatiye kirin. Mudaxaleya bikontrol a rayedarên AKP'ê qal dikin, di wêneyan de baş diyar e ku îşkence ye. **AMED**

Qirkirina pezkoviyan derxistin îhaleyê

Ji ber nêçîra ku li hemberî wan pêk hatiye koka hin cureyên sewalan qe-

liyaye û tenê di pirtûk û belgefilman de navê wan derbas dibin. Ji bo ku



pêşî li qirkirina sewalan bê girtin, hem li qada navneteweyî û hem jî li Tirkiyeyê peyman hatine çêkirin û bi van peymanan nêçîra sewalan hatiye qedexekirin.


Li gel qedexeyê jî di bin navê turîzmê de li gelek deverên Tirkiyê û bakurê Kurdistanê nêçîra sewalan tê kirin. Herî dawî

jî li Dêrsimê ji aliyê Herêma 15'ê min a Midûriyeta Wezaretê Daristan û Çandiniyê, ji bo nêçîra pezkoviyan îhale hat vekirin. Li 8 herêmên Dêrsimê jî bo nêçîra 17 pezkoviyan îhale hat kirin.

Di sala di 2019'an de jî hem bi destûra dewletê hem jî beyî destûra dewletê gelek pezkovî hatibûn kuştin. Ev jî bûbû sedema bertekan û li bajar jî bo qedexekirina nêçîrê kampanyaya înzeyan hatibû destpêkirin. Di encama van bertekan de bi înzeya waliyê Dêrsimê Tûncay Sonel, hemû xebatên nêçîrê yên li bajar hatibûn qedexekirin.

Bi berpirsyarî tevnagerin

Berdevkê Lijneya Parastina Mûnzûrê Hesen Şen jî der barê mijarê de axivî û diyar kir ku Midûriyeta Daristan û Hawirdorê ya Bajêr, di mijara venêrîna parastina sewalên kovî de berpirsyariya xwe bi cih nayne. Şen, destnîşan kir ku keya, şaredarî û qerekol ku dikarin pêşî li nêçîra pezkoviyan bigirin jî, bi xemsarî tevdigerin û mudaxaleyî rewşê nakin. Li ser medyaya civakî jî vekirina îhaleyê bû rojev û gelek kesan li ser hesabên xwe bertek nîşanî îhaleyê wezaretê dan. Li gel bertekên ku hatin nîşandan jî der barê betalkirina îhaleyê de jî hêla rayedarên wezaretê ve tu daxuyanî nehatiye dayîn. **DÊRSIM**



FÎLOZOFIYA JIYANÊ DI DINYAYA WAN JINAN DE HEBÛ

Rêbaza min a sereke, hezkerina vê çandê ye

→ Rizoyê Xerzî

Bi destpêkirina zanîngehê re min ji xwe re wiha got: Gelo çi kêmasiya zimanê min ji zimanekî din heye ku ez ê pê kar nekim. Zimanekî ewqasî dêrîn û bi qîmet, gelo çima ez ê xwe pê bi pêş nexim. Vê pirsê hişt ku ez berê xwe bidim çanda jiyana xwe

Zeyneb Yaş
kî ye?

Zeyneb Yaş li zanîngehê beşa zimanê fransî xwendiyê. Ji sala 1994'an vir ve xebatên berhevkarî û lêkolînên kelepûra kurdî dike. Di sala 2008'an de tevî Hilmî Akyol pirtûk û koleksiyona hunermenda navdar Eysel Şanê amade kirine ku ev berhem ji aliyê Enstîtûya Kelepûra Kurdî ve hatiye çapkirin. Her wiha bi navê 'Yadgarî' koleksiyona hunermend; Eysel Şan, Tahsîn Taha, Meyrem Xan, Nesrîn Şerwan, Elmas Muhamed, Gulbihar, Mehmed Hesen Kirofî, Mihemed Şexo, Erdeswan Zaxoyî, Eyaz Yûsif amade kirine.

Me dîsa berê xwe da serkaniya zargotina da û dapîran, bav û bapîran. Me ev hevpeyvîn bi berhevkar û lêkolînera çand û kelepûra kurdî Zeyneb Yaşê re kir.

Em dîzanin ku salên dîvûdîrêj in tu kar û xebatên berhevkarî û lêkolînê li ser çand û kelepûra kurdî dikî. Ji kerema xwe re ji me re behsa destpêka vî karî bike û çî bû sedem tu berê xwe bidî karekî wiha?

Tiştê herî zêde hişt ku ev kar bala min bikişîne, ez bawer im jiyana min a li gund bû. Biçûkiya min li gund derbas bû. Li gund bi kesûkarê xwe re ez di jiyaneke siruştî de bi çand û kelepûra xwe jiyam û vê yekê hişt ku ez ji serkaniya zelal avê vexwim. Lê piştî derbeya leşkerî ya sala 80'yî wekî gelek malbatên kurd malbata min jî peşkilî û berê me kete metropolên Tirkîyeyê. Siyasetê wekî malbat em gelek êşandibûn lê heman wextî hişmendî û hestên neteweyî bi me re xurt kiribûn. Li xerîbiyê me gelekî li ber xwe dida ku em çand û zimanê xwe biparêzin. Malbat, bi hişmendiyê siyasî li hemberî piştaftinê radiwestiya û her tiştên xwe li gorî wê rojekê hilbet vegeerî ser warên xwe saz dikirin. Ez di nav malbateke wisa da mezîn bûm. Li devera me yekem keç bûm ku min li gund dibistana navîn û paşê jî zanîngeh xwend. Ji aliyê zargotînê ve herî zêde bandora çirok, destan, kilam û stranên babê min û rihmetiya xaleta min Henîfe li ser min hebû. Ji bo parastina vê

zargotînê cara pêşî di sala 1991'ê de ku bavê min hate Stenbolê, min jî bi destana Mem û Zînê dest bi berhevkarîyê kir, hilbet ev berhevkarîyê ji tirs ku çirokên babê min winda nebin bû, ne bi zanebûn û zanistî bû. Lê paşê dema min li zanîngehê dest bi xwendina zimanê fransî kir, ku min bêtir ew ziman bizanibûya min 5 salan xwe fêrî wî zimanî bikira û min ê kar bi wî zimanî bikira, lê zimanê xwe yê heyî min dê nizanibûya pê bixwenda û tiştê bikira. Di roja yekê ya zanîngehê de vê nakokiyê hişt ku ez biryar bidim, pêşî zimanê xwe û paşê hemû zimanên din hîn bibim. Û xwe bi xwe min xwe fêrî xwendin û nivîsandina zimanê kurdî kir. Û çî dersê fransî min li zanîngehê bidîta, tedbîqa wî min bi kurdî dikir. Min li ser rêbazên biyaniyan dixwend ku wan ji bo zimanê xwe çî kar kirine. Zimanê min pê zanibû yê gundekî û deverêkê bû, min hewl da ku zimanê kurdî tevî dewlemendiya wî hîn bibim, zimanê xwe bi kelepûr û çandê dewlemend bikim û paşê jî çî bixwazim wî bikim. Meyla min herî zêde jî li ser bergeha jinan bû û min bi xebatên li ser jinan dest bi lêkolîn û berhevkarîyê kir. Ez di sala 2003'yan de ji bo xebateke meydaniyê li ser jinan vegeeriyam welat û li Amedê bi çî bûm. Paşê jî çûm Başûr, demekê li Silêmaniyê mam, min xwe fêrî zaravayê soranî, xwendina bi tîpê erebî kir, demekê jî li Duhokê mam li wir jî bi rêkûpêk dest bi xebatên lêkolîn û berhevkarîya çandê kir.

Lêkolîna te ya der barê hunermend Ayşe Şanê de berhemeke hêja û balkêş e, tu dikarî ji xwendevanên me re hinekî behsa wê berhemê bikî û çima te Ayşe Şan hilbijart?

Wekî min behs kirî meyla min a

xebatê her li ser jinan bû û bi taybetî jî li ser xebatên hunerî, edebî bû. Xwendin û agahiyên min ên li ser jin û fêminîzmê bêtir ji çavkaniyên oryantalist bûn lê li gorî xwe min her digot û didit ku jinên kurd xwediyê paşxane, kesayeti û rolek taybet bûn. Di xebata xwe ya meydaniyê de min rewşa jinên kurd ji nêz ve nas kir, kesayeti û taybetiyên wan jinan kartêkirinek mezin li ser min kir. Jinên azad ên welatekî bindest. Ew jinên xwedî taybetiyên xweser û bi vî xweserîya xwe bi hezarên salan welatek di hembêza xwe de parastibûn. Ev jin, xweyî îrade, wêrek, şareza bûn, serkanî û arşîva hemî serpêhatiya jiyana gelekî bûn. Ew jêderên sereke yên çand û dîrok bûn.

Wê yekê hişt ku ez bi rastî zêdetir berê xwe bidim jina kurd ku ew bi qasî Mezopotamyayê xwedî çandêkê dêrîn, xwedî rol û kargêrîyê mezin bûye û heta vê gavê xwe ragirtiye. Bi rastî vê yekê jî bandoreke mezin li ser min û hemû xebatên min kir. Her wiha hişt ku bêtir ez bala xwe bidim ser xebatên jinan.

Min dema ku berhevkarî wan jinan dikir, min dît ku ew xwe xwediyê çandêkê devekî ya ku heta vê gavê nehatiye nivîsandin ku ne tenê kurd lê dinya tev jê bêpar maye. Hemû filozofîya jiyane di dinyaya wan de hebû, hemû birdoziyên jiyane yê ku paşê ji aliyê filozofên mêr ve an jî ji aliyê şoreşgeran ve nav li wan hatibûn kirin lê jina kurd ew tev di hundirê xwe de sefadibûn. Bi hawayekî wisa ew zanebûn, têgi-hîştin, bixwebawerî, zanebûn, pisporî afirandibûn û pê dijyan bi rastî wê yekê jî bandorek mezin li min jî kir.

Dosyaya ku berhevkar Hilmî Akyol bi navê 'Çar Gulên Amedê' dabû ber destê Enstîtûyê, wan jî vê dosyayê xwest ku bi tenê berhemên Eysel Şanê wekî 'Yadgarî' koleksiyon amade bikin, ew xebat jî pêşniyarî min kirin ku ji wan re amade bikim. Bêguman min pêşniyara wan qebûl kir, ji ber ku min bixwe jî berhevkarî li ser Eysel Şanê kiribû û min dixwest ez tiştêkî li ser binivîsim, ji min re li hev hat. Tevî xebata mamoste Hilmî, 3 salan min berhevkarî û lêkolîn li ser jiyana û berhemên Eysel Şanê kir heta me koleksiyon û pirtûka wê amade kir.

Dengbêjî wekî hinekî bingehîn e ji bo parastina zimanê kurdî, hûn vê rolê çawa dibînin?

Der barê çanda dengbêjiyê de li gorî min bingeha dengbêjiya kurdan jî wê hafizeya dêrîn tê ku bingeha wê zarbêjen kurd in. Ew çirok, kilam û stranên ku di nav civaka kurd de ji aliyê zarbêjen kurd ve wekî hafizeyekê bi taybetî ji aliyê jinan ve hatine afirandin, hatine şifrovekirin û gotin. Ew li ser zaran hatiye veguhastin heta ku gihaye roja me ya îro.

Di vî dema dawî de piştî ku televizyonên kurdan çêbûn hinekî bêtir qîmeta dengbêjiyê çêbû. Berê digotin di dengbêjiyê de bêtir behsa serpêhatî û çirokên kesên ferdal tê kirin û gelek nimûneyên wê jî hebûn ku dengbêjan, tenê dengbêjiya ax, şex, mîr û malmezînan dikir. Bi gotineke din ew jî dengbêjen gel bêtir bi dengbêjiya kesên xuyayî û malmezînan dihatin naskirin. Li vir jî dengbêjî û zarbêjî tevlihev bûye, erê dengbêjan li koşk û dîwanên malmezînan dengbêjî dikir lê belê bingeha wê dengbêjiyê



zarbêjen kurd bûn ku heta vê gavê jî berdewam e. Hema mirov dikare bêje di her civatekê de, her gundekî de, her malekê de hinek ji wan zarbêjan peyda dibin û minakên wê jî gelek in wekî zêmarên di şîne de dihatin gotin, di dergûşan de lorandina ji bo zarokan, yên li ber paleyê dihatin gotin, yên di dawet û govendan de dihatin gotin. Em ji van tevan re dibêjin zarbêj ku ew bingeha hafizeya zimanê kurdî ne. Bi vê yekê wan destek dida dengbêjan, dengbêjan jî bi awayekî profîsyonel û bêtir bi rêk û pêk li koşk û dîwanan digot.

Ji bo ku karê berhevkarî û lêkolînê der barê kelepûra kurdî de li ser bingehê baş were meşandin hewcedarî bi çî heye?

Em gelekî ku xwedî çandêkê zengîn in û heta vê sedsala dawî jî ev çanda me bi devkî hatiye lê piştî ku kurdan bêtir berê xwe daye ber bi jiyana bajarî ve û pêwîstî pê ditine bi guherîna dinyayê ve entegrasyon û hevgirtineke pêk binin, zêdetir pêwîstî pê çêbûye ku ne tenê bi devkî lê bi nivîskî jî bingeha serpêhatiya jiyana kurdan bê nivîsandin, berhevkarî û tomarkirin. Bêguman ev yek gelekî girîng e, ji ber ku em miletek in xwedî nasnameyekê ne, neteweyek in ku xwedî roleke girîng in di Rojhilata Navîn de. Miletê kurd bi hezarên sala ku bînisî û bîdewlet bi hêza xwe ya neteweyî xak, ziman û çanda xwe parastine û heta roja îro hatine. Ji bo ku em bikaribin bi başî vê veguhêzî jî bo nîşên nû pêwîstî pê heye ku bi awayekî baş ev çand were fêmkirin. Ji bo ku paşeroj û pêşeroj bêtir bikaribin ji hev fêmkirin, raboriya miletekî hemû di vî çandê de veşarî ye. Çî weke dîrok, çî weke hebûn tev di nav vî çandê de veşarî ne. Lewre jî gelekî girîng e ku mirov vî xebatê bi taybetî û bi zanebûn deyne ber nîşên îro. Ji ber ku nîşên îro ne wekî yên berî sed salan in û ne wekî yên berî 50 salan in jî, ji ber ku teknoloji her roj bi pêş dikeve û nasnameya însan her roj hin tiştan li xwe zêde dike, an jî hin tiştan kêmkir.

Ji bo parastina wan hêmayên di nasnameya me ya taybet ku wekî neteweyekê de xebateke xwenaskirîne lazim e û ew jî ev e ku em karibin

raboriya xwe nas bikin ku em pê nasnameya xwe nas bikin.

Tu bi kîjan rêbazan lêkolînê xwe dikî û tiştê herî xweş û herî zehmet di vî karî de çî ye?

Heta ku ji min tê ez dixwazim şexwaza xebata min bi awayekî zanistî be. Rêbaza min a sereke ew e ku van karên em dikin ne ji bo tiştêkî rojane ne, an jî wekî roleke an karekî şexsî dikim. Berî her tiştî ez van karan ji bo xwe dikim, weke kesekê ku ez jê bêpar name , ez dixwazim ew kesayeti û şexsiyeta min a ku jê bêpar hatime hiştin û ji destê min hatiye derxistin, ez bixwe li xwe vegeerînim, pê tîr û tîjî bibim. Û wek mirovekê xwediyê wê rayê me û xwediyê wan pîzanînan im ku ew ê jiyana min dewlemend bikin û ez ê pê bextewar bibim. Her wiha ez wê kamîranî û xweşikbûna wan pîzaniyan bijîm. Pê re ew tiştê ku kêfa min jê re tê û ez girîngiyê pê didim ew e ku bi awayekî zanistî di jiyana hemû miletên dinyayê de tiştên xwe pê şanaz dibînin, kêfxweş dibînin, çî bin ez jî xwe wekî xweyê wan dibînim. Lewre di jiyana gelê min de ev şahnazî hene, ji ber ku em gelekî xwedî çand û zimanekî dêrîn in û xwedî berhem û hiş û hafizayekê gelekî girîng in di Rojhilata Navîn de. Ji bo em wê hiş û bîrê wekî milêk miletekî û heta wekî milêk mirovahiyê pêşkêş bikin, divê pêşî em tîbigîhên paşê em derînin ser rû, paşê jî em jê hez bikin û biparêzin û bihêlin ji bo siberojê. Jixwe rêbaza min a herî sereke jî hezkerîna e ji ber ku dema mirov ji tiştêkî hez neke mirov nikare wî tiştî baş bike.

Çî proje û xebatên te yên nû hene gelo?

Ez wê xebata Şakarên muzîka kurdî berdewam dikim û heta niha li derdora 10 cildan hatiye berhevkarî. Pêre jî xebateke min a din heye li ser muzîka Amedê, ew jî berhevkarî ye. Ji salên 1900 û pê de muzîka Amedê çî bû û çî hatiye tomarkirin. Her wiha li ser çanda gelêrî bi giştî ez hin xebatan dikim. Pêre jî ez hin gotaran li ser huner û muzîka kurdî dinivîsim. Wekî din jî pirtûka min a li ser hunermend Mihemed Şexo ji bo çapê amade ye û hêvî dikim ku di demeke nêz de em ê karibin wê jî çap bikin.

Xeletiya li ziman tê spartin

Yaşar Eroglu


Min gelek caran bi riya weşanê li ser paşgira 'van' û bikaranîna wê ya şaş dîtînen xwe anîn ziman. Lê bikaranîna şaş hê jî berdeyam e û ez ê careke din li ser mijarê û bi hin aliyên wê yên nîqaşê rawestim.

Paşgira 'van' weke paşgirên din peyvçêker e. Bi serê xwe wateya wê nîn e lê dema li paş navdêrekê tê danîn navdêreke nû pêk tîne û wateyeke din li heyîna gotinê kurdî zêde dike û gencîneya kurdî berfîreh dike.

Ziman hêmayeke zindî ye. Lê zêde dibe, tê dizê, diguhere, vediguhere, hin hêma jê tîn jibîrkirin, wate diguherînin, transforme dibin û hwd. Bingeha van yekan serdem, hewceyî, zemîna bikaranîna û pêçiriya (qabiliyet) ziman e. Guherîn û veguherîna ziman li ser wê zemînê pêk tê. Yên di qada ziman de serê xwe diêşînin vê rastiyê baş dizanin. Divê her guherîn û hewceyîyên nû li mantiq û xwezaya ziman re lihevkiirî bin. Jixwe lihevkiirî nebin weke organên bedenê yên protez, li bedenê weke organên resen rûnanên. Xav in, weke reş û spî lihevkiirî dimînin.

Asîmilasyon û niştecîhbûna li bajaran ku bi tirkî re rû bir û mane, di vî warê de jî gelek bandor li ser mantiq û têngîhiştina kurdî kiriye. Vê bazara şêlî rê daye ku gelek kes li ser zimanê kurdî şiyar bibin, berê xwe bidin zimanê xwe. Heta vê derê kêfxweşî ye. Lê bûye sedem ku ew ne bi zanetî be jî araste bibin ser mantiqê li bajaran û bandora asîmilasyona heyî û xeletiyên xwe weke rastî bispêrine zimanê kurdî-kurmançî.

Pirî caran bikaranîna paşgira 'van' bi mantiqa kurdî-kurmançî re nelihvkiirî ye, xelet e. Paşgira 'van' diçe paş kîjan peyvê wateya berevanî, payîn û lîxwedî derketinê pêk tîne. Rewşên wê yên awarte jî hene lê giranî mantiqa sazîkirina peyva ku nû hatiye darîştin wiha ye. Weke mînak; şivan, gavan, berxvan, golikvan, dergevan, baxçevan, bêrîvan, nêçîrvan û hwd. Hin peyvên awarteyên vê wateyê jî hene, weke; bilûrvan, şervan, dilovan. Ev peyvên li dawiyê, ji wateya berevanî, payîn û lîxwedîderketinê zêdetir pêkanîna nasnameya resen a peyvê (bilûr, şer, dil) tîne ziman. Çi awarte, çi ne awarte peyvên me li



Gelek kesan bi gencîneyeke peyv a teng paşgira 'van'ê weke şûrekî ko dane destên xwe, li her navekî kurdî dizeliqînin, haya wan ne ji ziman heye, ne jî ji mantiq û ruhê kurdî

jor amaje kirin reseniya bikaranîna paşgira 'van'ê didin xuyakirin. Yanî eger em bikevin şik û gumana bikaranîna paşgira 'van'ê em dikarin wateya lê barbûyî ya di van peyvên de çareseriyê derxin. Şaneya rehik (kôk hücre) a di vê mijarê de em serî lê bidin, ev peyv in.

Salên ku zimanê tirkî kete jiyana kurdan û kurd bi hebûn û zimanê xwe hesiyar vir ve, di qada bikaranîna zimanê me de xeletî û tewşî jî zêde bûn. Em dibînin ku her diçe peyvên wiha zêde dibin; guhdarvan, sitiranvan, kameravan, siyasetvan, berxwedanvan, rojnamevan, xwendevan, helbestvan û hwd. Bi rastî mantiqa van peyvên darîştî tewş in, eleqeya wan bi mantiqa kurmançî re nîn e. Ev yek bi dîtina me li jor diyar kir ku ziman zindî ye û diguhere re eleqeya wê nîn e, çûna ber bi xirabûnê nişanî me dide.

Gelo ji ber çi? Em yek bi yek amaje bikin, ji ber çi ye:

Peyva guhdar jixwe heye û mebesta ku peyva 'guhdarvan' dihebinê lê bar e. Guh+dar= guhdar yanî kesê guh didê, bala xwe dide ser gotinê, bi gotina tirkî 'dinleyici'. Ji bo ku peyveke sosyetîk bi kar binin 'van'ekî pê ve dikin. Jixwe navê guhdar hem tîrê dike hem bi ruhê kurdî re ye. Em navlêkirinên weke sitiranvan, kameravan, siyasetvan, berxwedanvan, rojnamevan, xwen-

devan, helbestvan bidine aliyekî navên wan ên bimantiq û ruhê kurdî re lihevhatî hene: sitiranbêj, kamerakêş, siyasetmedar, berxwedêr, rojnameger, xwende-xwîner, helbestkar. Navê 'xwendevan' weke 'guhdarvan' pir ecêb e. Wateya xwende ev e; kesê ku xwendin û nivîsandinê dizane, tiştêkî dixwîne. Yên navê xwendevan bi kar tînin 'van'ekî pê ve dikin di rastiya xwe de dibe kesê ku berevaniya yên xwendinê pêk tînin. Bi gotina tirkî dibe 'okurcu-yazarci'. Heman rastî jî bo 'guhdarvan' jî derbas dibe; yê berevaniya yên guhdariyê dikin. Bi gotina tirkî 'dinleyicilik işi yapan, dinleyenci'. Gelo hewce ye ku ew qas êş û janê bi ziman bidine kişand. Yanî ecêbiyeke ji ecêbiyan re bêjê rê bide min, dora min e. Haya bikarhênerên van navan nîn e ku kuştina zimanê xwe bi destên xwe dikin. Tu gotineke din hewce nîn e.

Gelek kesan bi gencîneyeke peyv a teng paşgira 'van' weke şûrekî ko dane destên xwe li her navekî kurdî dizeliqînin, haya wan ne ji ziman heye, ne jî ji mantiq û ruhê kurdî.

Hûn bi baldarî lê mêze bikin hûn ê bibînin ku sitiranbêjî, kamerakêşî, siyasetmedarî, rojnamegerî, helbestkarî û gelek navên ku paşê paşgira

'van' lê hatiye zêdekirin karên weke gavan, şivan, dergevan û hwd bi berevanî û lîxwedîderketinê ve bîn pênasîkirin nîn in. Pişê ne, pêçiriyeke (qabiliyet) taybet dixwazin, ne ji rêzê ne, paşgira 'van' lê nayê û li ruh û mantiqa kurdî rûnanê.

Dema em lîxwêrbûyî li ser van tîgehên bisekinin, em dibînin ku piraniya wan pişeyên ji bo erdnîgariya kurdan an nû ne yan jî daboriya wan ne pir kevn e. Jixwe ev xeletî, bi piranî çavkaniya xwe jî vê yekê digire. Gava hewceyîyên nû derdikevin pêş, bikarhênerên wan tîgehên li ser mantiq û ruhê kurdîya wan ranawestînin, berê xwe didine hêsaniyê. Hêsani jî dibe xeletî.

Rewş dilê mirov disotîne. Kurdî bi destên kurdan tê xirakirin. Ên ku xira dikin giraniya wan, hay ji xirakirinê nîn in. Lê yên ji xwe re dibêjin zimanzan û xwedî xebat in serê xwe ji rastîvîs û rêzimanê ranakin, xwedî li pirsgrîrêkên zimanê xwe dernakêvin, jî dîr ve lê temaşe dikin. Yek jî ji peywira wan ew e ku bi her amûrên pêkan, van pirsgrîrêkan rave bikin û bi metodên zimanasiyê hişmendîya zimanê rastîr ê ku dikare bê bikaranîna bixin rojeva kurdan.

Aqubet li serê kurdî be ku ew roj bîn.

Duşema Sor

Mem Farqîn

Gelo dema hûn hîn bibin, an jî bibihîzin bîsteke din yekî ku hûn nas dikin, wê were kuştin hûn ê çi bikin? Çawa tevbigerin? Meriv dixwaze wisa bawer bike. Hûn ê xwe bi awayekî bigihînin wî kesî an jî bi awayekî agahiyê bidin wî. Ne wisa? Tiştê ku tê bîra meriv ev e. Tiştê meriv li bendê ye, ev e. Û tiştê bê kirin jî ev e.

Lê belê dema meriv pirtûka Gabriel Garcia Marquez a bi navê Duşema Sor dixwîne, hê di risteya yekemîn de fêr dibe ku wê Santiago Nacar bê kuştin. Pirtûk jî ji xwe bi vê hevokê dest pê dike. Agahiyê dide xwendekar ku wê di nav saetekê de yek bê kuştin.

Pirtûk di heman demê de, me ji ciyê me yê bi ewle digire, me dibe nav jiyana şênîyên navçeyêke biçûk. Nişanî me dide ku jiyana wan çawa di nav xemsariyê de derbas dibe. Wisa ku em jî bi wan re kêlî bi kêlî dibin şahidê bûyerê. Her kî wê agahiyê dibihîse, di serî de bixwaze tiştê bike jî di nav demêke pir kin de dikeve nav pêlên xemsariyê û dibêje; wê çawa bibe, tiştê wisa ne pêkan e, wê karibe xwe biparêze û hwd? Li hember xemsariya wan em matmayî dimînin.

Bi awayekî aşkera neyê gotin jî, her kes li benda mirina wî ye. Her kes dizane, wê Santiago bê kuştin. Lê belê, tu kes jî ji bo wî xelas bike nakeve nav liv û tevgerê micid. Dilê xwe pê dişewitînin. Lê xemsar in, naxwazin baweriya xwe bi vê agahiyê bin. Vêya jî bi başbûna qesasan ve girê didin. Lewre heta wê deme nedîtine û nebihîstine ku ew her du birayên ku dibêjin "em ê Santiago Nacar bikujin" heta wê rojê bi bûyereke xerab nehatine rojeva navçeyê.

Disa dema meriv dest bi xwendinê dike, çawa di serî de dizane ku wê Santiago bê kuştin di heman hevokê de bangewazî û tîkaya weşartî jî dibine. Qesas ji bo ku wî nekujin jî aliyê yekî ve bîn sekinandin çî jî destên wan tê dikin. Lê belê ji şaredar bigire ta serleşkerên ewlehiyê û keşeyê dêrê. Tev jî dibihîzin lê tiştê nakin. Di nav xemsariyê de jiyana xwe ya rojane didomînin û li kuştina Santiago temaşe dikin. Ew bi xwe jî bi vê bédengî û xemsariya xwe dibin şîrikê vê bûyerê. A sosretir jî ev e.

Her ku em di nav rûpelên pirtûkê de pêşve diçin seba kuştina Santiago jî hîn dibin. "Namûs" Santiago (Eziz) û Angela (ferîşte - melek) jî hev hez dikin. Û beriya zewacê bi hev şa dibin. Bi rastî ev mijar jî pir zêde ne zelal e. Gabo vê jî me re dihêle. Û dema Angela bê dilê xwe bi yekî din re tê zewicandin şeva zîfafê ev derdikeve holê. Angela ne keçik e. Viya wek di roja me de jî tê jiyân ji bo namûs "bê paqîjkirin" "pêwîst e" "xwîn" "birjê". Wisa ku dema namûs tê gotin; ê çirokê jî me re vedibêje bi gotinê diya xwe rastiyê li ser çavên me dixê. "Ji bo namûsê kuştin şert e!"

Lê belê dema jinika şîrfiroş dibihîze wê ev buyer biqewime xwe bi xwe dibêje; "min carek din his kir ku em jin çiqas bi tena sere xwe ne. Em nikarin li gorî dilê xwe jî yekî hez bikin, bi merivekî re bizevicin, lê li ser navê me mîr tîn kuştin."

Li gorî min di nav rûpelan de tiştê hatiye weşartin û di din xemsariya şênîyên navçeyê de ev heye. Dewlemendiya malbata Santiago, di hişmendîya wan de, jî alîkî ve fikra xwe dikare biparêze û ava dike. Ji aliyê din ve jî di nav gel de, li hember dewlemendan tovên tolhildanê hatiye çirandin. Santiago keferata guncê hên bavê xwe ye.

Pirtûk bi tevahî 106 rûpel e. Ji aliyê Încî Kut ve li tirkî hatiye wergerandin û ji weşanxaneyê Canê ve hatiye çapkirin. Zimanek gelek herikbar e û heta dawî jî meriv nikare pirtûkê ji destê xwe berde. Min tenê ev nivîsand. Lê dema Gaba tê gotin, helbet bi hezaran çirok di nav çîrokê de hene. Baldar bin. Dema we pirtûk, xwend hûn jî nebin şîrikê kuştina ezîz û ferîşteyan...



Xweşkanî

Felemez Ulug



Hevkariya li gorî berjewendiyan...

Dewleta tirk her sal bi hinceta tunekirina PKK'ê li başûrê Kurdistanê dest bi operasyonan dike. Bi van operasyonan re dewleta tirk bi alikariya û erêkirina PDK'ê li gelek deverên cuda yên nêzî baregehên PKK'ê qereqol û navendên sîxuriyê dane avakirin. Li van baregehên ku ji hêla MÎT'a tirk ve tên diyarkirin bi yekîneyên pêşmergeyên PDK'ê yên taybet ve bi awayekî hevkar xebat tê meşandin.

Cihên baregehên nû lî ten avakirin jî, ji bo operasyonên li dijî tevgera azadiyê hîn xurtir bîn meşandin û birêvebirin bi baldarî tên diyarkirin. Li herêma navçeya Rewandîzê li çiyayê Helemod ê heramberî Zînê Wertê pêşmergeyên PDK'ê bi cilê leşkeran hatine bicihkirin. Ev pêşmerge bi çekên giran xwe li herêmê bi cih kirine. Li heramberî vî yekê gelê herêmê neheret be jî ji aliyê siyâsî û hikûmeta herêma Kurdistanê ve deng dernakeve.

Ji bo li herêma başûrê Kurdistanê baregehên nû bîn avakirin di navbera PDK'ê û dewleta tirk de li hevhatin çêbûye. Li gorî vî jî bo şopandin û meşandina vî xebatê di navbera herdu aliyên de komîteyek hevbeş hatî avakirin. Ji bo mesrefa van baregehên jî lihevhatin çêbûye. Li gorî vî PDK dê li qaseya hikûmeta herêmê pera xerc bike, dewleta tirk jî dê bi pereyê petrola ku ji herêma başûrê Kurdistanê diçe Tirkîyeyê bide. Lê em ji bir nekin ku dewleta tirk ev demeke dirêj e pereyê petrola ji Kurdistanê digirt nedaye ku ev jî budçeyek mezin e. Bi kurtasî di herdu alî jî ji bo tasfeyekirina tevgera azadiyê û dagirkirina başûrê Kurdistanê pereyê herêma Kurdistanê xerc dikin. Di heman demê de mirov dikare bejê PDK bi pereyê gelê Kurdistanê dijî-minantiyê bi axa xwe û doza azadiya Kurdistanê dike.

Di van baregehên jî hêla PDK'ê û dewleta tirk ve tên avakirin de ne kesên jî rêzê dimînin. Li gorî zanyariyên heytê gotin ku hêzên PDK'ê yên bi navê tûgaya 80'yemîn tên binavkirin û qaşo parastina herêma Biradost û Rewandîzê dikin wê di van baregehên de bîn bicihkirin. Em jî bir nekin ku baregehên li van herêman jî salên 90'î ve di bin kontrola MÎT'a tirk de ne. Lewma hêzên ger jî van baregehên jî bîn wê dîsa di bin kontrola MÎT'ê de kar bikin. Dîsa jî derveyê pêşmergeyan wê di van baregehên de endamên MÎT'ê û leşkerên hêzên taybet ên artêşa tirk jî bîn bicihkirin. Jixwe gelek caran nûçeyên endamên MÎT'ê li herêmên di bin kontrola gerila de ne bi cilê pêşmergeyan keşfan dikin derketin. Niha bi avakirina van baregehên ve vî xebata xwe ya veşarî aşkera dikin.

Dewleta tirk û PDK bi avakirina van baregeh û qareqolan dixwazin bi saya agahiyên jî van navendên sîxuriyê darbeya mezin li tevgera azadiyê bixin. Jixwe ev demeke artêşa tirk li gor agahiyên jî sîxurên bi alikariya PDK'ê li herêmê hatine bi cihkirin gelek êriş kirin. Di van êrişên îstixbarata wan de yekser gelek welatî hatin qetilkirin. Niha PDK bi avakirina van baregehên li herêmê hevkarîya xwe û dewleta tirk xurt dike.

Lê pêwîst e PDK baş bizane ku wê rojek were, ew jî poşman bibe ku leşkerên tirk xistiye herêmê. Lê wê ew jî nikaribe wan jî wir derxe. Hevaltiya li gorî berjewendiyan hatiye avakirin bi kesî nade qezençkirin. Di vir de yê zilm û zorîyê dibîne dîsa gelê kurd e.

'Bila êriş neyên tolerekirin'

Navenda Nûçeyan

Operasyonên leşkerî û siyâsî yên li heramberî başûr, bakur û rojavayê Kurdistanê li Ewropayê bûn rojev û hat diyarkirin ku li herêmê sûcên mirovahiye tî jiyîn

Heftaya borî kiryarên li heramberî herêmên Kurdistanê di rojava Ewropayê de bûn. Operasyonên siyâsî yên li heramberî siyasetmedarên kurd ên li bakur, operasyonên leşkerî yên li heramberî başûr û rojavayê Kurdistanê di rojevê de bûn.

Rêxistinên mafên mirovan ên navneteweyî bînpêkirina mafên mirovan a li Rojava pêk hatî xist rojê xwe. 69 parlamentêrên Parlamentoya Ewropayê bertek nîşanî operasyonên siyâsî yên li heramberî siyasetmedarên kurd ên li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê sûcê mirovahiye dikin û sûcê komkujiya nijadî dikin. Komên çekdar mal û milkê welatiyan talan û wêran dikin. Dest danînin ser malê welatiyan. Welatiyan dirêvînin. Li dijî welatiyan muameleyên keyfî dikin. Dişewitînin û êrişî nîrxên civakî, çandî û dirokî yên wekî goristan, sembolên çandî û nîrxên din dikin. Ev bînpêkirinên mafan di raporên Rêxistina Efüya Navneteweyî, Rêxistina Şopandina Mafên Mirovan (HRW) û Komisyona Lêpîrsînê ya Sûriye ya Navneteweyî ya Serbixwe de jî heye û hatiye teyîdkirin."

Li herêmê sûcê mirovahiye

Bertek û nêrazîbûnên li dijî kiryarên ku li heramberî Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê pêk tê didomin. 18 rêxistinên mafên mirovan ku di qada navneteweyî de jî bo parastina mafên mirovan tedişikînin, ji serokê Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê, Sekreteriya Giştî ya Konseya Ewropayê re der barê kiryarên de nameyek şand. Di nameyê de înzeyên Komeleya Parastina Mafên Mirovan a Awusturyayê, Komîteya Parastina Mafên Mirovan a Sûriyeyê (MAF) û gelek rêxistinên mafên



mirovan ên sivil hene.

'Êrişî nirxan dikin'

Parêzvanên mafên mirovan bal kişand ser bînpêkirina mafên mirovan û wiha gotin: "Komên ku Enqereyê piştigiriyê dide wan, li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê sûcê mirovahiye dikin û sûcê komkujiya nijadî dikin. Komên çekdar mal û milkê welatiyan talan û wêran dikin. Dest danînin ser malê welatiyan. Welatiyan dirêvînin. Li dijî welatiyan muameleyên keyfî dikin. Dişewitînin û êrişî nîrxên civakî, çandî û dirokî yên wekî goristan, sembolên çandî û nîrxên din dikin. Ev bînpêkirinên mafan di raporên Rêxistina Efüya Navneteweyî, Rêxistina Şopandina Mafên Mirovan (HRW) û Komisyona Lêpîrsînê ya Sûriye ya Navneteweyî ya Serbixwe de jî heye û hatiye teyîdkirin."

'Mal û milk tî desteserkirin'

Parêzvanan, destnîşan kir bînpêkirina mafan bi raporên hatiye belgêkirin û di nameya xwe de

wiha bi lîv kirin: "Rêxistina HRW'ê di mijdara 2019'an de raporek amade kiribû. Li gorî raporê Tirkîye destûr nade ku kurdên Sûriyeyê vegezin axa xwe. Dîsa piştî ku destûr nadin kurd vegezin ser mal û milkê xwe, mal û milkê kurdan jî talan dikin.

Av hat qutkirin

18 rêxistinên mafên mirovan di nameyê de wiha behsa qutkirina ava herêmê kirin: "Piştî operasyonan komên çeteyan li herêmê hatin bicihkirin vî carê jî av li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê qut kirin. Her wiha li herêmê zeytûn û zexîyên din ên welatiyan hatin talankirin û şandin Tirkîyeyê. Di 9'ê cotmeha 2019'an de li dijî Serekaniyê û Girê Spî operasyon kirin û ev du bajar xistin bin kontrola xwe. Gelê kurd û ereb jî ber ewlehiya canê xwe herêm terk kirin û derbasî herêma Hêzên Sûriyeya Demokratîk (HSD) bûn. Wekî Efrînê li Serêkaniyê û Girê Spî jî sûcên komkujiya nijadî dikin."

Parlamentêrên Ewropayê hişyar kir

Li Parlamentoya Ewropayê, Tifaqa Azad a Keskan a Ewropayê, Koma Demokratên Sosyalîst û Demokrat (S&D) Çepa Kesik Îskandinav-Çepa Girtî jî tê de, 69 parlamentêrên gelek fraksiyonên cihê name jî Nûnerê Taybet ê Polîtîkayên Ewlekarîyê û Karên Derve yê Yekîtiya Ewropayê Josep Borelle re nivîsandin.

69 endamên Parlamentoya Ewropayê diyar kir ku divê kirinên AKP'ê

yên li dijî hiqûqê neyên tolerekirin. Parlamentêrên da zanîn ku pergala serokîyê ya tirk, rêgeza darizandina serbixwe qels kir û wiha hat diyarkirin: "Hevşaredarên Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) bi awayekî bêhiqûq jî peywîrê hatin standin û li şûna wan 'wafî û qeyûm' hatin peywirdarkirin. Ji hilbijartina 31'ê adara 2019'an û heta niha jî 65 şaredariyên HDP'ê, 46 şaredarî hatine

desteserkirin."

Parlamentêrên bal kişand ser êrişên hewayî yên artêşa tirk ên li ser Şengal û wargeha Mexmûrê û wiha nêrînen xwe anîn ziman: "Ji ber operasyona di 15'ê hezîranê de ya li heramberî başûrê Kurdistanê jî fikarên me zêde dibin. Di 23'yê hezîrana 2020'an de li Kobanê bi droneyan êrişek hat kirin, welatî hatin qetilkirin û birîndarkirin. Tirkîye endamê NATO

û Konseya Ewropayê ye. Ji bo Yekîtiya Ewropayê jî welatekî berendam e. Divê ev kirinên wê yên li dijî normên demokratîk ên hiqûqa navneteweyî û neteweyî neyê tolerekirin. Em bang li we dikin ku li dijî rejîma otokratîk tîkevin nav hewldanan. Em jî komîsyonê dixwazin ku ji xeynî van êriş û zextan jî bo bidawîkirina êrişên li dijî hiqûqê jî, bila gavên lez-gîn û şênber biavêje."

Kampanyaya înzeyan didome

Kampanyaya înzeyan a ku ji hêla Ciwanên Welatparêz û Jinên Ciwan ên Tekoşer ve hatî destpêkirin didome. Li dijî êrişên li heramberî başûrê Kurdistanê heta niha bi hezaran înzeyên hatine komkirin.

Ciwanên kurd xebatên xwe li Duhok, Hewlêr, Silêmanî, Ranya, Helepeçe, Qendil, Kelar û Kerkûkê didomin. Ciwanên kurd bi hemleya Seferberiya Heftanînê kampanyaya xwe dimêşin. Di sala 2011'an de jî Ciwanên Welatparêz û Jinên Ciwan ên Teekoşer, li başûrê Kurdistanê li dijî êriş û baregehên leşkerî yên tirk li Başûr û Iraqê milyonek înzeyên kom kiribûn. Kampanyaya înzeyê li ser

Change.org ê jî hatiye destpêkirin. Li ser medyaya dijîtal jî gelek belav bûye. **HEWLÊR**



Berhem Salih li dijî êrişan derket

Serokkomarê Iraqê Berhem Salih li Qesra Bexdayê ya li paytext Bexdayê bi sefirên welatên ereb re hat cem hev. Di civînê de tevî xurtkirina tîkiliyên bi welatên ereb re, jî bo di gelek qadan de hevkarîyeke baş çêbibe rê û rêbaz girtine dest.

Serokkomar Berhem Salih di civînê de diyar kir ku pêwîst e rêveberiya Enqereyê êrişên xwe yên li heramberî xaka Iraqê tavilê rawestîne û wiha axivî: "Divê bînpêkirinên leşkerî tirk bi dawî bibe. Operasyon hem bînpêkirina serweriya Iraqê hem jî bînpêkirina ewlehiya herêmê ye. Welatiyên



bira û komkara erebî divê li heramberî bînpêkirinên Tirkîyeyê yên li Iraqê didomin helwest bigirin."

Ligel vî nûnerên welatên ereb jî bal kişand ku piştigiriyê didin hewldanên Iraqê yên tîkildarî parastina serwerî û xaka xwe ya li heramberî mudaxleyên derve.

BEXDA

Bila firotina çekan bê sekinandin

Li Parlamentoya Ewropayê bi navê "Li Behra Spî îstîfkar, ewlekarî û rola neyînî ya Tirkîyeyê" rûniştineke desteya giştî hatibû lidarxistin. Li Parlamentoya Ewropayê rexneyên giran li Tirkîyeyê hat kirin. Her wiha di civînê de firotina çekan a jî bo Tirkîyeyê jî hat nîqaşkirin.

Di civîna Parlamentoya Ewropayê de polîtîkayên Tirkîyeyê yên li heramberî li Behra Spî ya Rojhilat û Lîbyayê jî bi zimanekî tund hatin rexnekirin. Gelek parlamentêrên di civînê de diyar kirin ku Tirkîye "rejîmeke otokrît e" û bila muzakereyên bi Enqereyê re werin sekinandin. Ji parlamentêrên banga rawestandina alikariyan jî hat kirin.

Raporê Neteweyên Yekbûyî (NY) yê li Tirkîyeyê û parlamentêrê Îspanyol Nachos Sanchez-Amor diyar kir ku divê Tirkîye hurmetê nîşanî normên Ewropayê bide. Serokê Koma Demokratên Xirîstîyan, parlamentêrê alman Manfred Weber jî xwest ku bila dawî li muzakereyên endamtiyê yên bi Tirkîyeyê re were anîn. Li ser navê koma Renew a xwedî meyleke lîberal, parlamentêrê Fransî Nathalie Loisea da zanîn ku Tirkîye li gorî nîrxên Ewropayê tevnagere û bi dijîminatî tevdi-gere. Li ser navê Koma Komunîst (GÛE) parlamentêrê alman Ozlem Demirel bal kişand ser mafdariya parlamentêrên û da zanîn ku divê tu kes çekan ne-firoşe Tirkîyeyê. Endamê Koma Demokratên Sosyal, parlamentêrê Kibrîsê Costas Mavrides da zanîn ku Almanya çekan difiroşe Tirkîyeyê û got: "Tirkîye jî van çekan li dijî nîrxên Ewropayê bi kar tîne."

HDP'ê bernameya xwe diyar kir

Bernameya 'Hevdiñên Demokrasiyê' ya Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) ku di çarçoveya Bernameya Têkoşîna Demokratîk de dabû destpêkirin, diyar bû. Wê di vê pêngava duyemîn de HDP bi gelek beşên civakê re bîn gel hev. HDP dê destpêkê bi nûnerên parastinê ku li dijî pêşniyarqanûna baroyan derdikevin re bê gel hev.

Dê li ber derê girtîgeha Amed û Muzeya Ûlucanlar a Enqereyê, bi dirûşma "Em tev bi hev re ji bo hiqûq û mafê mirovan tîn gel hev" daxuyanî bide. Ji bo karkerên çandiniyê dê bi dirûşma "Hevdiñên Kedê ya bi Karkerên Çandiniyê yê Demsalî re" li Riha û bajarên din çalakîyan li dar bixe. HDP ji bo komên bawerîyan jî xebatekê bi rê ve dibe. Wê bi mijara "Em ji bo Azadiya Gelan û Bawerîyan Tîn Gel Hev" di 18'ê tirmehê de li Hatayê hevdiñenek pêk bîne. Di 20'ê tirmehê de roja salvegera Komkujîya Pirsûsê li Stenbolê bi malbatên qurbanîyan re çalakîya rûniştinê bê lidarxistin. Ji bo kedkarên ku ji kar hatine avêtin bi navê "Hevdiñên Demokrasiyê û Edaletê" çalakî bîn lidarxistin. HDP dê rêzeçalakiyên xwe li Îzmirê bi dawî bike. Her wiha HDP dê di 1'ê Îlonê Roja Aştiyê ya Cihanî de li gelek deveran mîtingên girseyî li dar bixe. **ENQERE**

Îran û Sûriyeyê peymanê leşkerî îmze kir

Serokerkanê hêzên çekdarî yê Îranê bi Wezirê Parastina Sûriyeyê peymanek hevkarîyê ya leşkerî îmze kir. Her wiha hişyarî dan dewleta tirk.

Heftaya borî li Sûriyeyê, serokerkanê hêzên çekdarî yê Sûriyeyê Mihemed Baqirî û Wezirê Parastina Îranê Elî Ebdullah Eyûb peymanek leşkerî îmze kir. Li ser naveroka peymanê agahiyên fermî nehatine parvekirin lê berfirekirina hevkarîya leşkerî û armanca giştî ya lihevkerîyê ragihandin. Her wiha hinek çavkaniyên Îranê, ji medyaya derve re ragihand ku hevkarîya Îran û Sûriyeyê ji bo bihêzkirina parastina asmanê Sûriyeyê ye. Di vê çarçoveyê de, piştî îmzekirina peymanê, serokerkanê hêzên çekdarî yê Sûriyeyê Mihemed Baqirî bal kişand ser hevkarîya her du welatan a li beramberî zextên Amerîkayê û got: "Îran dê pergala parastina asmanî ya Sûriyeyê bihêz bike." Her wiha Baqirî hişyarî da dewleta tirk ji wiha axivî: "Tirkîye di çarçoveya danûstandinê astanayê de hinek soz dane, lê li paş dixê. Divê Tirkîye bizane ku rîya çareserîya pirs-girêka ewlehiyê bi mayîna di nav xaka Sûriyeyê de çareser nabe. Rîya çareserîyê tenê danûstandin û lêtêgihîştina bi Sûriyeyê re ye." **ŞAM**

Banga bidawîkirina destwerdanê kirin

Heftaya borî Fransa, Almanya û Îtalyayê bang li aliyên Lîbyayê kir ku şer rawestînin. Di heman demê de bang li aliyên derve jî kirin ku destwerdana xwe rawestînin. Fransa, Almanya û Îtalyayê bi daxuyaniyê bang li aliyên Lîbyayê kir ku şer rawestînin. Her sê dewletan di daxuyaniya hevpar de wiha got: "Bi zêdebûna rewşa xeternak li Lîbyayê; Fransa, Almanya û Îtalya bang li hemû aliyên Lîbyayê dikin ku yekser bê şert şer rawestînin. Her wiha divê aliyên derve hemû awayên destwerdana xwe li Lîbyayê bisekinînin." **PARÎS**

Karekî zanistî

Hisên Çatikkaş

Filozof Karl Marx, ji yazdeh tezên xwe yê li hemberî Feuerbach nivîsandî, di ya dawî de dibêje ku; "Filozofan cihan tenê bi hinek awayan şirove kiriye; lê di rastiyê de pirs-girêk guhertina wê ye" ango dibêje filozofan bi gelek awayî cihan şirove kir lê hewce ye êdî ji bo guhertina cihanê tiştekî bikin. Rewşa kurdî/kurmancî jî dişibe vê cihana ku Marx behsê dike. Lewra gelek kurdîhez û dildarên (zimanzan, mamosteyên kurdî, sazî û dezgehên kurdî hwd.) kurdî/kurmancî bi gelek awayan rewşa wê şirove kirin lê êdî hewcedarî bi guhertina rêbazan heye. Ji ber ku rêbazên bi kar tînin, tîra guhertina rewşa kurdî/kurmancî nakin. Nîşaneyê wê yekê jî di nav wê gotina wan de veşartî ye: "Heke rewşa kurdî/kurmancî bi vî awayî bidome wê heta 40-50 salên din kurdî/kurmancî wê bimire." Li vir heke rêbazên me tîra pêşlêgirtina mirina zimanê me nekin, hewcedariya me bi guhertina rêbazan heye da ku em pêşî li mirina zimanê xwe bigirin. Lewra di nivîsê de em ê qala xebateke zanistî û rêbazeke cuda bikin.

Di vê xebatê de ku ji aliyê zanîngeha Sorbonê beşa Înalcoyê ve hat çêkirin, ji bo kurdî/kurmancî rêbazeke nû hat ceribandin. Bi rêya ZOOM'ê li ser înternetê xebateke berfireh di van rojên koronayê de pêk hat. Vê xebatê 8'ê nîsanê dest pê kir hetanî 22'yê gulanê bînavber 45 rojan, hin rojan 6 saet hin rojan jî heta 12 saetî ders domiyan. Ev bernameyê tîra jî tîjî bû. Kesên li vir ders dan, ji zanîngehên navdar ê

welatên cur bi cur bûn. Helbet tiştê ku ev mamoste anîn cem hev kurdî bû. Pêşkêşiyên hemû mamosteyan bi zimanekî zanistî û rêkûpêk bûn. Ango meriv dikare bêje ku di van dersan de bi kurdî/kurmancî behsa felsefe, wêje, civaknasî, derûninasî, mîto- lojî, jineolojî û metodolojîyê bi awayekî zelal hat kirin. Mamosteyên ku ev ders dayîn; Îbrahîm Seydo Aydogan, Michael Chyet, Mîchîel Leezenberg, Abdulwehab Xalid Mûsa, Janroj Yilmaz Keleş, Jan İlhan Kizilhan, Jaffer Sheykhoslamî, Dawud Yeşilmen, Adnan Çelik, Hacer Petekkaya, Zozan Sîma, Joanna Bochenska, Hashem Ahmedzadeh, Lûqman Guldivê, Engin Sustam bûn. Hemû mamosteyan kedeke mezin da lê divê li vir xaleke taybet ji bo Îbrahîm Seydo Aydogan û Hacer Petekkaya were vekirin. Ji ber ku bi taybetî Îbrahîm Seydo Aydogan sebreke mezin nîşan da û eforeke zêde xerc kir. Tevî ku dersên dayîn di hemû dersan de wek moderator ked bû. Ji bo bêpirsgirêk bername jî bêpirsgirêk bi dawî bû.

Di van dersan de analîzên xurt, pirsên baş, bersivên tîra jî tîjî hebûn. Ango zimanê kurdî/kurmancî tîra vegotina van mijaran dikir. Gelek kes dibêjin ku kurdî tîra vegotina felsefe, mîto- lojî, derûninasîyê û hwd. nake. Lê me di van dersan de dît, kesên biyanî ku piştê hîni kurdî bûne bi awayekî hêsan û zelal qala van mijaran kirin. Lewra em dikarin bîjin ku dil bixwaze ziman jî ji vegotinê re amade ye.

Li tevayî Kurdistanê û gelek



welatên cihanê (Ewropa, Qazakîstan, Japonya, Amerîka) bi tevlibûna li ser 350 kesî re beşdar hebûn. Hejmara beşdarên jin ne bi qasî ya mêran be jî ne ji mêran pir hindiktir bû jî. Piraniya beşdaran kesên zanîngeh xwendibûn. Lewra asta nîqaş û pirsan jî tîra jî tîjî bû. Di nav beşdarên de nivîskar, helbestkar, hunermend, rojnameger, mamosteyên zimên, xebatkar û xwendekarên zanîngehên Rojava hebûn. Ango ji her beşa civakê beşdarên cihê xwe di vê xebatê de girtibûn.

Piştî dersên mamosteyan di her du hefteyên dawî de jî ji aliyê 80 beşdarî zêdetir ve, bi mijarên cur-bicur pêşkêşî hatin kirin. Û hetanî dawîya meha hezîranê jî divê ev pêşkêşî wek gotar bigihijine ber destê mamosteyan. Em dikarin bîjin ku herî kêm 80 gotarên di mijarên cuda de wê bêne nivîsandin. Di nav van mijaran de beşdarên li rojava bi piranî li ser rêziman pêşkêşiyên xwe kirin. Yê bakur jî piranî wêjaya kurdî wek xalên sereke danîbûn pêşîya xwe. Li derveyî van mijaran mîto- lojî, dîroka kurdan û destanên kurdî wek mijarên sereke derdike- tin pêş.

Li gorî bawerîya min ev jî karekî pîroz wîrdetir karekî zanistî

bû. Ji ber ku li ser agahiyên akade- mîk ên kurdî xebateke pîrhêl û berfireh bû. Lewra em dikarin bîjin ku tevlibûna van dersan zan- yariyên me li ser kurdî/kurmancî pir bi pêş xistin. Vê xebatê di heman demê de nîşanî me da, bi qasî pirs-girêkên li ser kurdî/kur- mancî ewqasî dewlemendiya wê jî heye. Pir hêlên wê yê veşarî hene, da ku lêkoler li ser bixebite.

Wek encam di pirtûka pîroz Yuhanna de, hevoka ewilî ev e "berê gotin hebû." Li hemberî vê gotinê jî Goethe dibêje ku "dest- pêkê de çalakî hebû." Dema em van her du gotinan deynin ber hev û li rewşa kurdî/kurmancî meyzê- nin bêguman em ê bîjin ewilî gotin heye. Lê ya rast ev e ku divê em bîjin êdî dema gotinê xilas bûye û rêbazên ku em bi kar tînin tîra xilaskirina zimanê me nakin. Ji ber ku em niha di serdema ni- vîsê de ne, nivîs li her derî ye û xwe li ser mirovan ferz dike.

Rewşa kurdî/kurmancî jî hê di asta gotinê de ye, ango rewşa wê tîra gotinê lê nayê pehtin. Ji bo kurdî/kurmancî dema pehtinê ye. Ev xebata li ser ZOOM'ê ji aliyê Înalcoyê ve hat dayîn jî, ga- veke qerase bû ji bo guhertina rêbaz û gotinan. Bi hêviya gurki- rina xebatên bi vî awayî...

'Guh bidin pêşniyarên sendîkayan'

Navenda Nûçeyan

Li Tirkîyeyê her tim rewşa karkeran li holê bû û kesên dihatin parastin sernemadar û alîgirbûn. Di pêvajoya vîrusa koronayê (Covid -19) de ev tişt bêtir derket holê. Ji bo karkeran tedbîrên pêwîst nehatin girtin û bi mirinê re rûbirû hatin hiştin.

Li Tirkîyeyê desthilat di bin navê "Mertala İstihdamê" de "Pergala Teqawidiyê ya Temamker (TES)" xistibû rojevê. Bertekên li dijî wê yekê didomin. Bi vê pergala tîra xwestin tazmîna kidemê dewrî fonê bê kirin. Sekreterê giştî yê Konfederasyonê Sendîkayên Karkerên Şoreşger (DİSK) Adnan Serdaroglu bertek nî-

şanî wê yekê da û got: "Pêşnûmaya qanûn hêj ne amade ye lê tenê di çapemeniyê de hêlên wê yê baş tîra servîskirin. Hêlên wê yê xirab jî tîra veşartin. Dixwazin civakê bi hêlên wê yê baş bixapînin."

Nikarin plansaziye bikin!

Serdaroglu, destnîşan kir ku dewrkirina tazmîna kidemê ya ji bo fonê jî hêleke şaş ve tîra niqaşkirin û got, heya niha desthilatê tim xwestiye tazmîna kidemê ji holê rabike û wiha dom kir: "Em behsa heqekî dikin ku 84 sal in pêk tîra tîra qismek perê karkeran li cem karmendan di- mîne. Dixwazim bêjim ne serkomar ne jî hin kesên din nikarin der barê perê karkeran de, hin plansaziyan û

taserufê bikin. Kidem, ne bexşek e ku karmend an jî dewlet didin me. Parçeyek perê me ye ku me li cem karmend hiştiye. Loma ne rast e ev mesele di ser fonê re tîra niqaşkirin."

Herî dawî Serdaroglu destnîşan kir ku desthilatê şewb û krîza aborî ji xwe re kiriye firsend û wiha dawî li axaftina xwe anî: "Lê divê desthilatê bi aqilekî selîm tevbigere û guh bide pêşniyarên sendîkayan. Tazmîna kidemê pêşeroja we ye, mîrateyek e ku mezinê we ji we re hiştiye. Ji bo xwedîderketina li tazmînatê piştgi- riyê bidin tîra koşinê."

Tedbîr nayên wergirtin

Nûnerê Sendîkaya Karkerên So- reşger ên Tekstîlê (Dev-Tekstîlê) ya Çukûrovayê Ahmet Sübaşı, diyar kir ku li herêmên pişesaziya vîrusa koronayê gelek belav bûye û wiha axivî: "Li herêma serbest ku nêzî 10 hezar karker lê dixebitin, ji ber ku bender- geheke navneteweyî ye ji bo belav- bûna vîrusa koronayê şertên wê guncav in. Me ev rewş anîbû ziman. Lê hişyariyên me nehatin guhdarîki- rin. Niha li 10 kargehan vîrus heye. Li gel wê yekê jî rayedarên şirkete, ji karkeran re tenê dibêjin baldar bin û bergiriyên xwe bigirin. Careke din em rayedarên hişyar dikin ku bi sendîka û rêxistinên pişeyî yê tenduristiyê re bi awayekî hevpar

bergiriyên werbigirin."

Alîgirên xwe girtin kar

Fabrikaya tekstîlê ya bi navê Ozak a yêdê Holdinga Ozak Glo- bal ku li Rihayê ye ji bo vîrusa ko- ronayê navber dabû karê xwe. Piştî pêvajoya "asayîbûnê" dest pê kir, tekstîlê dest bi hilberînê kir lê belê cudakariyê xist navbera kar- keran. Firmayê karkerên endamên sendîkaya Hak-İşê ya nêzî hikû- metê girt kar lê belê tenê hin kar- kerên endamên Sendîkaya Tekstîlê ya girêdayî DİSK'ê û gelek karke- rên endamên wê sendîkayê negirt kar. Karker diyar dikin ku tenê se- demek wan venegeriyane karê xwe heye ew jî ji bo ku endamên Tekstîl Sen'ê ne. Rayedarên fir- mayê soz daye karkeran dê piştî 1'ê tirmehê bigirta kar. Piştî serê mehê karker çûn kar lê ewlekar û leşkeran karkeran asteng kir û li karkerên bi navê Ahmet Yusuf Çali û Erkan Taş dabûn.

Erkan Taş û Abdulbakî Aksû ku endamên Tekstîl Senê ne û hêj vene- geriyane karê xwe, diyar kirin ku wan xwestiye ew biçin kar lê li leş- ker û ewlekarên taybet li wan dane û tevî rayedaran soz daye wan jî dest bi kar nekirine. Karkeran got ku dixwa- zin hejmara karkerên sendîkayî ku xwe bi rêxistin dikin kêm bikin.





Dê ciwan kilamên wî bibêjin

Navenda Nûçeyan

Dengbêj Seyîdxanê Boyaxçî di 5'ê firmehê de li Amedê çû ber dilovaniya xwe. Seydo Şimşek di nav gel de wekî Xalê Seyîdxanê Boyaxçî ango Bilbilê Amedê dihat nasîn. Cenazeyê Seyîdxanê Boyaxçî li goristana Yenikoy a Amedê hat veşartin.

Seyîdxanê Boyaxçî li navçeya Amedê Erxeniyê li Gundê Lexeriyê di sala 1933'yan de hatibû dinê. Ew hîna 2 salî bû dayika wî û 4 salî jî bavê wî rehmet kir û hîn zarokêkî biçûk bû sêwî mabû. Seyîdxanê Boyaxçî di zaroktiya xwe de şivanî kir, pêlav boyax kirin, ava sûsê firot û emeletî kir.

Bilbilê Amedê

Dema mirov diçû mala dengbêjan ger Seyîdxanê Boyaxçî li wir bûya teqez hebûna xwe dida ferqkirin. Ne tenê bi deng û awaza xwe her wiha bi henekên xwe jî hewşa mala dengbêjan şên dikir û wekî bilbilekî dengê wî li nav sûrên Amedê olan dida. Piştî mirina wî gelek kesan li ser medyaya civakî wêne û dûmenên ku bi wî re kişandine parve kirin. Piraniya wêne û dûmenan jî li mala dengbêjan hatine kişandin.

75 salan kilam gotin

Hunermend Farqîn Azad û dengbêj Seyîdxanê Boyaxçî gelekî bi hev re xebitîn, bi hev re stran gotin. Farqîn Azad wiha behsa wî dike: "Me jî Xalê Seyîdxan re dipirsî, me digot; Xalê Seyîdxan emrê te çend e, digot ez nizanîm. Texmînî em wekî 90 salî dizanin. Xalê Seyîdxan di wan 90 salan de herî kêr 75 salan dengbêjî kiriyê û kilam gotiyê û ji bo vî gelî xizmetek mezin kiriyê. Ev taybetmendiyê Apê Seyîdxan e ku 75 salan kilam gotin ji bo her kesî nabe nesib. Gelekî zor e, 75 salan bênavber mirov kilaman bêje. Li gorî wî digot 90 sal emrê wî bû û di 13 saliya xwe de dest bi stranbêjîyê kiribû."

Xalê Seyîdxan di sala 1978'an de dema ku li kolanên Amedê kilaman

Bi salan dengê Seyîdxanê Boyaxçî li kolanên Amedê olan da. Bilbilê Amedê koça dawîn kir. Wî êş û kederên xwe bi dengbêjiyê anîn ziman. Dê zarok û ciwan li keda wî xwedî derkevin û stranên wî bibêjin

dibêje û boyaxê dike, şaredarê wê demê Mehdî Zana Xalê Seyîdxan dibîne qondera xwe li cem boyax dike û jê re dibêje; 'Seydo dev ji boyaxê berde were li şaredariyê bixebite. Piştî ku teqawit bû careke din li kolanên Amedê kilam gotin.

Farqîn Azad wiha behsa naskirina dengbêj Seyîdxanê Boyaxçî kir: "Dema ku Navenda Çand û Hunerê ya Dicle Firatê di sala 2003'yan de li Amedê vebû me lêkolîn dikir ku em dikarin kîjan dengbêjan binin saziyê. Ji me re gotin Xalê Seyîdxan heye. Wê demê jî Xalê Seyîdxan li qehweyan pêlav boyax dikirin. Me jê re got; Apê Seyîdxan cihê te ne ev der e, tu were kilaman bêje, cihê te saziyên ku ji bo gel tên vekirin e. Tu li van saziyan karê xwe bike. Li wê derê yanî di 2003'yan de me Xalê Seyîdxan nas kir û heta roja îro jî têkiliyên me bi hev re hebûn. Ji wê demê heta niha jî ber tayînkirina qeyûman a ser şaredariyên gel û xespîkirina saziyên gel em jî hev qut bûn."

Dîroknasekî dengbêjiyê bû

Farqîn Azad got ku ew Bilbilê Amedê bû û wiha axivî: "Gelek bîranînên me bi hev re çêbûn. Em dikarin bêjin Xalê Seyîdxan dîrokek bû. Hemû stranên kurdî dizanibûn girêdayî çanda xwe bû. Xalê Seyîdxanê Boyaxçî jî bo kurdan bireke bêbînî bû. Ji ber ku li ser dengbêjî disekinî. Wekî dîroknasekî dengbêjiyê bû. Gelek dengbêj nas kiribû, bi gelek kesan re têkilî danibû, bi gelek kesan re şevbihêrk derbas kiribû. Di bîranên xwe de behsa Mihemed Hadî dike, behsa Şakiro dike, behsa dengbêjên ku bi wan re şevbihêrk derbas kiriyê dike"

Seyîdxanê Boyaxçî gava jê re gotine, tiştên tu dizanî binivîse, gotiyê, "Min nekarî binivîsim, min tenê got. Dengbêjî evînek e. Tevî zehmetiyên



hemûyan, ya ku kir ez li ser xwe bim, gotina kilaman bû. Xelk ji kilamên min hînî gelek tiştan bû. Min tiştê bihistî got."

Derûniya dengbêjiyê

Veysî Varlî got ku dema mirov dengbêjiya wî dinêre li gorî civatê derûniya wî xurt dibû û an jî lawaz dibû û wiha got: "Di warê derûniya dengbêjiyê de gelekî pêşketî bû. Li civatê dinêrî û li gorî wê strana xwe digot. Eger stranek kêr û an jî zêde bigota û deng ji qirika wî baş derketiba mirov digot Xalê Seydo kêfa te bi civatê nehat wî jî digot erê. Yanê kesekî zelal bû."

Em jî bûn ap û amojin

Veysî Varlî anî ziman ku Safîdînê Ormîyeyî di sala 1260'î de bi navê Risaletî Şerefiyê pirtûkek nivîsand, îro tevahiya dinyayê di warê matematika muzîkê de jê sîd werdigire lê ew bi xwe di hepsê de ji ber deynan mir û wiha pê de çû: "Gotina devê wî ye roja xwedê da jî bexwedî bû. Li ber destê ap û amojinê mezin bû, lê roja mir em jî jê re bûn ap û amojin."

Nasandina Xalê Seydo

Lêkolînerê muzîkê Veysî Varlî wiha behsa nasandina Seyîdxanê Boyaxçî kir: "Min ew di sala 1976-1977'an de nas kir. Wê demê li Kolana Melîkehmedê pasaja Alman hebû li wir du bira hebûn, kaset tije dikirin û difrotin. Navê wan Muharem û Ahmed bûn. Yek jî berê li taxa Ereşêxê kesekî bi navê Îzedîn hebû berê şîrnayî difrot lê piştê teyîp kirî, kaset zêde dikirin, dengbêjî dianîn û dengê wan qeyd dikir. Dengê Xalo Seydo jî qeyd kir. Kasetên ku zêde dikirin li ser ereboka sê teker li cadeya Melîkahmedê û derdora Uluca-miyê difrot.

Wê demê ez jî bi muzîk û deng re eleqedar dibûn û min cara ewil li mala Îzedîn Xalê Seydo guhdar kir. Wê demê min jê re got xalo dengê te ne Serhedî ye, got xwarzî Serhedî çi ye? Min got dengê Serhedî bilind e, wexta diqire guhê meriv kerr dibe, dengê te dengê beriyê jî nîne, pir nerm jî nîne. Me got di navbera herduyan de çûye û hatiye, wisa me henek li hevdu kirin. Min got dengê te li stranên evîniyê tê."



Keda wî nayê jibîrkirin



Hunermend Farqîn Azad got ku dê her tim keda wî ya pîroz û xwedîderketina wî ya li hunera kurdî bi bîr bînin û wiha got: "Heta roja îro jî bênavber ji bo vî gelî xizmet kiriyê û stran gotine. Gelek heyranên Xalê Seyîdxan hebûn. Heyf û mixabin me dîrokek winda kir. Ji bo me windahiya deng-

bêjên mîna Xalê Seyîdxan, windakirina dîrokekê ye û xemgîniyê gelek mezin e. Ji bo me Xalê Seyîdxan çinarekî mezin bû, me wê çinara xwe winda kir. Em dibêjin wekî Xalê Seyîdxan di demên pêş de ciwanên me stran û kilamên xwe bibêjin, li çand û hunera xwe xwedî derbikevin.

Dê ev yek ji bo me bibe serbilindiyek mezin. Kêfxweşiyê din jî ew e ku me yekî wek Xalê Seyîdxan nas kir. Ez gelek kêfxweş im ku min ew derfet zevt kir bi wî re çend heb stran got. Me li hewşa Dicle û Firatê gelek kilam bi hev re gotin, ez gelek tişt jê hîn bûm."

Ji Delav



Feratê Dengizî

Tirsa Asê

Ev çi jiyana e yabo!
Neyê serê tu kesî.

Bi rastî jî nasandin û fêhmkirina wê tirsê mesele ye.

Nizanim çawa rave bikim û ji ku ve dest pê bikim.

Dayika min ji her tiştî, ji her kesî û ji her rewşê ditirse. Di ser de jî heyrana tirsê xwe ye. Ji çî/kê/kî bitirse jê hez dike, dibe evîndarê tirsdarê xwe. Ji dewletê, ji apê xwe, ji kalikê xwe, ji bavê min, ji rikberên me, ji bûka xwe ditirse û evîndarê tevan e. Ji ber wan diricife, difikirim ku aliyekî tirsonekiya min ji wê/vê rewşa wê tê. Kî qedr û qîmetê bide, lê xwedî derkeve û wê biparêze dibe neyarê wan. Xwîna wan vexwe têr nabe.

Nizanim ev çi mesele ye.

Roja wê bi tirsê derbas dibe ligel şeva wê û ligel vî emrê dirêj. Deng ji derî bê, ji telefonê bê, mêvanek bê, teqîniyek sivik be jî bê, rêwiyekek bibuhure, erebeyên bi xirecir (di wê navberê de bibêjim ku mala me li çaryana rê ye û betal nabe) tev wê ditirsînin û nasakine, li nav malê diçe û tê. Teqîna gopalê wê ye; teq, teq, teq...

Na, ne dîn e. Ji min û te biaqiltir e, dîroka zindî ye û arşîva wê, hişê wê pir xurt e û pir xweş dipêyîve û çîrok û mesele û metelokên wê naqedin, serê mirov dibe, mirov aciz dike, lê ditirse. Ha, wê jî bibêjim ne tirsonek e. Bi qasî her mirovê normal e, tirsonekiya wê. Lê ji jiyana, ji hebûnê ditirse. Lewra xêr ji wan nedîtiye. Xêrnedî ye.

Ya ecêb, evîndarbûna wê ya tirsdarê wê ye.

Îja ku yeke/i ji xwe qelstir dibîne îmana wê/i derdixe.

A cîrana me aqil berdaye, weke Apê min, bêhiş e, neyê serê tu kesî. Çi zilm û eziyeta jiyana û zordariya ku tu bibêji hatiye serê wê. Nikarim derde wê têxim rêzê, lê ma zilma bindestiyê bi serê xwe her tiştî aşkere dike. Min got, hiş berdaye û sedema bingehîn jî eze-zok, çavbirçî, çavnebar û qelsiya li ser feqîriyê ye. Gazinok, minminok û dawî dawî ev anî serê xwe ligel derdan. Îja diya min li hêviya wê ye û hêrsa xwe tev di serê wê de derdixe.

Ecêb e tirsê diya min. Ji xwe pê ve ji tu kesî jî hez nake. Her tiştî, her bûyerê, her meseleyê li gorî hewcedariya xwe dipêve; ew ê çiqasî zirarê bidê, wê dipêve, wekî din her tişt jê re vala ye. Aktoreke xurt e, ecêb dileyze. Mirov dikare bibêje jiyana wê rol e.

Îja ez qala qencyên wê nakim, ew bêpîvan in. Lê ya ku dixwazim bibêjim; tirsê wê û sedema wê binhişiya wê ye. Mirov çawa dikeve wê rewşê! Ravekirin pir zor e.

Gelek aliyên min jî jî wê rewşa wê tê; dizanim.

Gotina kin ku di hişê min de diçe û tê; Xwedî bindestiyê neke para tu kesî...

Tew ku tu kurd bî!

Rewşa Kerkûk û Şingalê jî bi ser de hat!

Şanika Şayh Maran⁽³⁾

Mehmet Seyîtalıoğlu

Roj û helm û saetî rew ravêrenê. Na şanika xo de kotî mendîme. Heya !..

Berano şîya xo berzo to ver, hewt tabaxî şona binêhardî. Berano qer ser ke to bigêro halê to beno yaman. Hewt katê binê hardî de ti se kerî? A wext daha xelasa to nêmanêna.

Rojê yenî Belkîya vayşt ra şî. Şî a mergîza de xo dard we. Belkîya tameşe kerd ke di beranî amey hênî ser o ta jubînî ra. Belkîya xafila di çimê xo kerdî ya û vat; 'ya Xizir'xo eşt beranê sipî ser. La beranê qerî xo kerd ver ra û hewt katê binê hardî ro berd. Hewtkatêbinê hardî ro berd diya tariye de vet. Ca ver de peyxamberê axir zamanî diyayênê, Belkîya dinya roştî nêdiye. La çi taw ti dinya roştî bivînî. Xo rê bi na mesela ra bi texeliye.

Cemşit qet vengê xo nêvet. Na mesela sero teseliya xo kerd. û omide xo birîye. Waxtêde bin lêwê Şahê Maran de mend . Uca bax û baxçe de ke gêra, çerexîya, xeceliya Şahê Maran ra ancîya pers kerd;

-E ma beranê qerî Belkîya hewt tabaxî binê hardî ro berd, diya tariye de vet, ê cara tepîya sebî?

Şahê Maran cira vat ke;

-Belkîya şî o ca de ke vecîya ke a dinya dîna zê dinya ma wa, Şî lêwê ju axayî de bi xizmetkar. Şuwanîne kerde. Axayê xo ra vat ke;

-Axayê mi ez amo gino na dinya tariye ro, to ra minêta mi esta ke, mi veje dinya roştîye.

Axayî cira vat;

-Kes nêşikîno to vêjo dinya roştîye. Lê ti ke zaf wazena şo filan ca de ju teyre esta. Nameyê na teyre Zumrût Anka wa. A ca de ju darêde girse esta. Zumrût Anka her serre a dara girse ser o halên wirazena. û çelka vejêna. Marêde girs esto, muso lêyranê Zumrût Anka yeno her serre lêyranê a teyre weno. Ti ke şêrî ê halênî bipewe wexto ke mar ameyîranê teyre buro ê marî bikîşî, a wext belkî a teyre to vejo dinya roştîye.

Zobîna kî teseliya xo na xebere ra

bifiye.

Na vatene ser o omidê Belkîya tenê bî kewe. Hetanî şodirî xêyal kerd. Bî şodir, Belkîya uşt ra tîr û tîrkiwanê xo girewtî şî lewê a dara girse de mar pît. Çand rojî ke ver ra, çend rojî kî mend endî heq zano. Rojê seyr kerd ke marêdo girs ha wo ancîno dare. Ancîno dare eke şero lêyranê Zumrût Anka buro. A wext qîştayîşt kewt ra lêyranê Zumrût Anka ro. Henî qîştay, henî qîştay, henî qîştay vengê qîştayîşê lêyran şî pey hewt koyan da kewt goşanê maye. Maye heşna ke vengê lêyranê aye yo. Ê hêrsî ra Zumrût Anka kemerêda girse girewtete mawênê peranê xo.

Zumrût Anka Vat;

-No kam o her serre yeno lêyranê mi weno. Şêrî pirodî dewr ra bikerî. Perre ra, perre ra amey ke lêyranê xo bixelesno. A hona ke nêreyta Belkîyayî tîrê tîrkevanê xo antî, tîr pey vileyê marîde şana ci. Seke tîre şîye ginay pey vilê marî ra, mar xir bî binê dare de lifî erziya pêser. A wext Zumrût Anka ameye reyşte. Belkîya dotê dare de dibî. Henî zanit ke o yo her serre yeno lêyranê aye kişeno weno. Ebe hêrs wext mend ke xirxê kafika Belkîyay da pirodo. A linge lêyri qîştay vat;

-Day, dayê mede ey ro. Ey ma remnayîme ra marî dest ra. Zumrût Anka xirxê bota eştê. Ame lewê Belkîyayî. Ci ra vat ke;

-Ti kam î, çika, kotî ra yena kata şonî? To lêyre mi remnay ra, miradê mi ardo herinde. Mi ra vaje miradê to çi ko, ez kî miradê to biyarî herinde.

Belkîyayî vat ke;

-Şikîna mi veje dinya roştîye.

Zobinakî miradê min o bîn çino.

Zumrût Anka vat ke;

-To ez cayêde teng de pê girewto. Se bikerî ez o ke miradê to biyarî hûrîndî. Urze şo seba raye goşt, awike pêda bike ez to vejî dinya roştî. Mi raye ra to ra vat vêşano goşt berze gulya mi, mi ke vat têşano awike gulya mi ke ke xo ra ke mi beşe kerd to vejî dinya roştî. Nêne mi ke beşe nêkerd tecelê xo yê siyayî ra bimiradîye.

Belkîya uşt ra Şahê Maran ra hal wazîyet qisey kerd. Şahê



Maran emir da ci rê çi lazim o amade bikerî. Seba raye goşt, awike kerde heqîba. Ard huzire Şahê Maran de nêro. Wero ke ardo Belkîya gêno şono huzirê Zumrût Anka. Tef talo ke ardo bar kerd peranê Zumrût Anka ebe xo kî nişt ci. Zumrût Anka perê ra vejîye raye. Zaf şî, şenik şî endî heq zano Zumrût Anka vat.

-Vêşan o.

Belkîyayî goşt eşt gulîye ver.

Xêli ca şî vat;

-Têşan o.

Awike erzeno gulya Zumrût Anka.

Endî raye şenikêk mend bî. Zumrût Anka vat vêşano. Tike goşt peyen ard ke berzo gulya Zumrût Anka dest ra gina waro. Belkîya kardîya xo cebê xo ra veyeno, çapika qorê xo yo qalindî ra hebe keno cira erzeno gulya Zumrût Anka û peynîye de Zumrût Anka Belkîya vejeno dinya roştîye.

Zumrût Anka lokmo peyen nêqulotnena ra. Binê zonê xo de dana we.

Zumrût Anka Belkîyayî ra vana;

-Raye şanê şo.

Belkîya qayîl niyo Zumrût Anka nê çi peyhesîya. Çare nêvî-nêno. Gama xo erzeno. Belkîya gama xo ke erzeno, tey lêngeno. Zumrût Anka ci ra vana;

-Bê bê mi goştê to binê zonê xo de da we.

Qorê kena rut loqmeyê peyeni

fekê xora vejena. Nana cayê bîrînê ra, alîya xo kena tira. Şanêno raye, şono.

-De şo. To rê oxir bo.

Na çêse kerdena ŞahêMaran ra tepya Cemşit amey ra xo. Omidê xo tenê bî kewe. Tenê vindert cira pers kerd.

-Ya Şahê mi Belkîya ke vejîya dinya roştî uca ra tepya se bî. Şî uca se kerd. ŞahêMaran vat;

-Şero se bikero. Şî ju sukede vejîya.

Uca xêli wext feteliya. Raştê ju xocî ame. Xoce zaf zanaye bî, wendox bî. Kitab de seyr kerdêne. Îlm zanitêne. Îlm û îrfan zanaye bî. Belkîya nê xocî de kewt mowet. Ebe rojan mowet kerd.

Xoce pêhesîyo ke Belkîya lewê mi ra amo. Şahê Maran diyo. Keno ke Belkîyay bixapêno.

Oncîya Xoce pêhesîyo ke Hêqî ebe destê cebrailî nîşano morkerde dayo Sultan Silêymanî. Sultan Silêymanî hukmêne morî ra hukmê dinya alêmi teyr û turî işniyan cisnî kerdêne. Xocî kerdo kafika xo ke kam ke morê Sultan Silêymanî bifîno xo dest hukmê dinya û alêmi û teyr û turî fino ra xo dest hukim keno.

Ancîya Xoce pêhesîno ke Sultan Silêyman dinya xo vurnaya. Teyr û turan meyîtê Sultan Silêymanî berd, zerê hewt deryayan de, ju eskefte de wertê tabuta zernêne de darde we.

Oncîya hesîyo pê ke Sultan Silêmanî kî cayêde ju dare esta, velge a dare bigêro binê lînganê xo ra kero serê deryaye ro xij beno şono. Nêgineno awike ro. Lê a dare diyayene kî Şahê Maran diyayene lazima. Çike Şahê Maran kam ke tey bêro, ucade çixa ke dar û ber esto velg û vaş esto yeno ra zon. Çi çi çinay rê derman o ebe xo fek xo keno eşkera.

O Xoce hesîyo pê ke Belkîya amo cayê mi kî zano. Ayera ke nê xeberan Belkîyayê rê ke qisey keno balkî ey qan kero. Bêro herindîya dar û ber esto, velg û vaş esto, têde yeno ra zon. Çikê rê çi dermano ebe fekê xo vano. Kam ke ŞahêMaran bivîno û pelgê a dare dozkeroy biyaroy binê lînganê xo ra kero. O beşe keno deryayan sero xij bibo şero. Wertê deryayan de kî zerê ju maxarade meyîtê Sultan Silêymanî bivîno maran nîşanê ke bêçika Sultan Silêymanî de ey bigêro, bêçika xo kero, aye ra tepya kî hukmê dinya alêmi bikero.

Ma tede nîya dîme. Na hukumdariye peynîya xo çi tawa ba.

Dewey Ma



Cemil Oguz

cemilo@diyarname.com

Ez Omedya

Namey mi Omedya ya. Wexto şima fotografê mi vîna ez des roci biya. Erê, erê, ez rast vana, ez tenî des roci biya. Egir wextê şima zi bibo ez şima rê qalê deh rocanê xo bikerî.

Wexto ez amiya dinya kêfê dadî û babê mi ame. Ez dima ra pê hesiyawa ke ez tûteyê inan a diyinan a.

Roco verîndê mi parçeyke bedenê xo ra kerd fekê mi, mi ewca ra çike şimitna. Ez nêzana çi bî, la weş bî. Mi çawey werd qasêke bîn hewnê mi ame û ez kewta ra. Her wexto ez bine veşane ez bermayne û dadê mi ew perçe kerdê fekê mi û mi zi qismetê xo werdê.

Verê dadê mi de keynayke bine bibî. Çawey dadê mi ez kerdê verekey xo, ay zi waştê dadê mi ay bikero verekey xo. Qey ay nêwaştê dadê mi mi bigiro verekey xo? Ez nêzana. Belkî... Dadê mi ay ra vatê, "A zi wakey to ya, a henî çikcika, hela vinde ez şit bidî ay."

Ez nêzana çende roci dewam kerd, la wexto ma verê beyrayke de vindertîbî û way mi zi zey mi bermayne mi zana meselayke esta la mi nêzanayne mesela çi ya.

Henî vengî hameyine la mi keye de vengê anyinê xo nêşinawitî bî loma ez nêzana inan vatê çi.

Dima ra inan ma berdî caynan. Ma kerdî odaye tarî. Serd bî. Ez rehet nêbiya, re rey canê mi recefiyane. Dadê mi ez wişk bi xo wa şedêdanayne û ez kerdêne germine. Ez nêzana ma çende roci ewca mendê, la ewca weş nêbi. Dima ra ma berdê odaye bin. Ewca henî pîrekê binî bibî, zey dadê mi bî. Inan mi ra hez kerd. Veng hame mi, inan ra yewe vat, "Way çimê mi korî bê, çi sîcê ene tûte esto." Sîc çi bî, mi nêzanayne. Ez ke hema zerey pîzey dadê xo ra veciyawa, ka go sîcêkey mi o seyîn bibo?

Mi vîna yewa bine va, "Verî pîrekêke ceza biwerdêne zi, egir bi-hemlbayne yan zi tûte/ê cay qic bibayne a ceza tepîya eyştêne, enka ana zi nêkene. Bawne enî wîrdî çickenan ra. Kê mi biveyşo."

Pîrekêke bine hamî way mi girote we, tedir kay kerd. Hebênan hamî ez kerdî verekey xo. Çimê dadê mi ra hêstî hameyine war. Ez nêbermawa, mi nêwaştê dadê mi ver biko û bibermo. Tenî wexto ez zehf bine veşane ez bermayne. Ez nêbermayne la Reyna zi dadê mi bermayne. Dadê mi nê qey xo, qey ma bermayne.

Pîrekêke hamî namey ma persa, dadê mi way mi mot ra va, "Namey eney Nesef a." Verê xo da mi, la vinderte. Ez hema des roci biya ma hamey tiya. Odey bin de ma çende roci vindertîbî û enka ez çende roci biya ez nêzana la name nêdabî mi. Dadê mi zewgir çike bikero vinî û newe pê bihesiyo ke kerdo vinî. Va, "Ana çi serê ma ro derbas bî qey ma firsend vîna namey cay rûnî."





Dildarê Amedê

Berfîn li ku ye?

Vê hefteyê dora kaniyê dora Berfîn Dîjle bû lê li gorî min bihîst têkiliya wê û rojnameyê ji hev qut bûye û nema dikarin xwe bigihînin hev. Hûn ê bêjin ma çawa çêbû telefon heye, malperên civakî hene e-mail û peyam hene. Min jî wiha got lê rojnameyê got tenê têkiliya wan û Berfînê li ser malpereke civakî bû û ew rûpel jî hatiye girtin. Îca heyra welehî ez jî nizanim çi mesele ye, hema xwedê xêr bike. De ka heta dîsa têkiliya wan saz bibe xwedê mezin e. Dibe ku ew bi xwe bi nivîsekê ji me re qal û behsa vê winda-bûna xwe bike. Bi her halî Berfîn winda ye û quncika wê jî bi min maye. Min got ez li şûna nivîsa wê, îro ji we re behsa mesela kêmbûna nivîskarên qerfê bikim.

Wekî tê zanîn, ji berê de di nav kurdan de hişmendiyeke wiha hebû ku bi çavekî kêr li kesên stranbêj, hunermend û sazvanan dinêrin. Gelek mînak li ber çavên min çêbûne, dema ku zarokê dixwest xwe hîni tembûrê bike dê û bav dixeyidîn û jê re digot, ma qey tu mitirbî. Di vî warî de gelek hunermendên ku niha bi nav û deng in jî, dikarin behsa destpêka xwe bikin û çawa malbat li dijî wan derdiketin. Bawer im ji wan hejmareke ne kêr, tembûrên wan di serê wan de hatine şikandin.

Ne tenê di warê muzîkê de, di warê şanogeriyê de jî civaka me bi çavekî kêr li xwedyê wê hunerê dinêrin, wekî mînak qirdikê sersalê. Tê bîra kesên navserê berê di şeva sersalê de yek dibû qirdikê sersalê, rûyê xwe tenî dikir û tevî çend hevalên xwe li nav malên gund digeriya û ji wan re henek û laqirdî dikirin.

Minakeke din a balkêş, di vî warî de bi şanogerê hêja (Bavê Teyar) re çêbû. Rojêkê beriya cejna Newrozê koma şanoyê diçe gundekî da ku provayên xwe bikin. Li wî gundî pîrejnek tê xwe nêzî Bavê Teyar dike û jê re dibêje ez gelekî ji te hez dikim. Bêguman kêfa Bavê Teyar jî tê û dibêje ez spas dikim dayê. Paşê jî dayê jê re dibêje de ka xwedê ji te re razî, ji me re hinekî meymûniyan bike. Feqîrê Bavê Teyar sar dibe û di dilê xwe de dibêje wey gidî pîrê te em kirin meymûnî jî.

Her wiha tevî ku qerf û henek di nav kurdan de gelekî belave û di civat û şevbêkan de, di jiyana xwe ya rojane de jî qerf û henekan dikin lê dîsa jî di binhişê wan de henek bi qirdikî û meymûniyê ve tê girêdan. Lewre jî dibe ku ji ber vê yekê ye, di nav kurdan de nivîskarên qerfê dinivîsin gelekî kêr in. Mixabin ev nêrîna han, gelek kesan dûtî nivîskariya qerf û henakan dike û di eslê xwe de dema ku ew nivîskarî baş were kirin, karekî pir cidî û hêja û giranbûha ye.

Nivîskar an jî şanoger di wî kenî de peyamên xwe digihîne civakê. Hem wan dikenîne û dilê wan xweş dike hem jî pê re peyameke bibandor digihîne civakê.

Bi her halî, wekî ku niha nêrîna li hunermendan hatiye guhertin dê rojêkê ev nêrîna li şanoger û nivîskarên qerfê jî were guhertin. Ji bo mesela Berfînê jî kesên ku haya wan jê heye ji kerema xwe bila peyamekê bişînin e-maila rojnameyê. bBî hêvî me ku teştek bi serê wê nehatibe û niha li ser peravên ava gola wanê li geşt û seyranê be. Her wiha ez bangekê li nivîskarên qerfê dikim, kesên ku bixwazin qerf û henekan binivîsin jî dikarin xwe bi riya e-mailê bigihînin rojnameya Xwebûnê û hûn sax.

Trêna dînan

Carekê hemû dînan di nexweşxaneyê dînan a Şamê de firsendekê dibînin û ji nexweşxaneyê direvin. Li ser wê yekê tevlihevîyeke mezin çêdibe û parêzer li berpîrsê nexweşxaneyê digere û jê re dibêje we çawa rê daye ku birevin, tu mecbûrî bi lez û bez tevan vegerînin nexweşxaneyê. Berpîrsê nexweşxaneyê mirovekî zîrek bû, jê re dibêje tu tenê firsenda 24 seantan bide min, ez ê tevan vegerînim nexweşxaneyê.

Berpîrs civînekê bi xebatkarên nexweşxaneyê re çêdibe û ji wan re dibêje em ê listika trêna ya gelekî kêfa dînan jê re dihat bilîzin û dakevin kolanên taxê, gava me bibînin wê tev

werin tev li listika trêna bibin. Berpîrs pêpîkekê dixê devê xwe û xebatkarên wî jî yek bi dawa wî digire û yên din jî wiha li pey wî birêz dibin. Wiha berpîrs dest bi pêpîka xwe kir û dibêje tût tût trêna reş e ... tût tût hêdî dimeşe û yên din li pey wî lê vedigerînin û wiha ji hewşa nexweşxaneyê berê xwe dan taxên derdora xwe. Di nav çend seantan de, rêza trêna wan gelekî dirêj bû, êdî ne serî ne jî binê rêzê xuya dikir. Berpîrs berê trêna xwe da hewşa nexweşxaneyê û piştî ketin hewşê ji xebatkarên xwe re got êdî deriyê hewşê bigirin û wan bijmêrin ka kesek li




derve ma yan na.

Piştî ku ew hejmartin dîtin ku 100 kes li wan zêde bûne, hejmara dînan revîyan 400 bû dîtin ku zêdeyî 500 kesan bi trêna wan re hatine nexweşxaneyê.

Îca bi texmîna min heke di van rojên zor û zehmet ên zilm û zordariyê de trêneke wiha dakeve nav kîjan bajarê me wê ne 100 kes, bi hezaran li vê trêna dînan siwar bibin.

XAÇEPIRS



JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ

- 1. Kar û xebata mirov 3. Roja em tê de ne 5. Di dawiya hemû duayan de tê gotin 6. Meh 7. Çê, ne xirab 9. Sîrên bejî 12. Hejarî, belengazî 14. Noteyeke muzîkê 15. Dîtarî, sohbet, hevdiîn 17. Heke, eger 18. Bersiva neyênî 22. Dizîya malê cemaweriyê, bertîl

JI JOR BER BI JÊR

- 1. Di encama hatina ba hev a çend kesan an jî tiştan de pêk tê, grûp 2. Peryên Iraqê 3. Rojêke hefteyê 4. Dîn, bawerî 5. Hunermendekî nemir ê bi eslê xwe ermen bû 7. Niştêcihê bajaran 8. Laçik, destmal, her wiha li hin deveran li şûna bajar tê bikarnîn 10. Pêxemberek 11. Zanistî 13. Bawerî. 14. Terpilî, dikir ku bikeve erdê 16. Kul û êş 19. Irkê gelê kurd, faris û hin gelên din 20. Alav an jî kûpê ku berê tiştên malê ên wekî rûn, dimis tê de dihatin hilanîn. 21. Noteyeke muzîkê 23. Cînavka kesê/a yekemîn a yekjimar

Bersiva hefteya borî



Li cihê du kurd lê hebin, li wir folklor heye

Felat Nishtiman

Hejmarê 6'ê min a kovara Folklorame hat çapkirin. Di vê hejmarê de 23 nivîsên analîz, berhevkarî, danasîn û lêkolînên li ser folklorê hene.

Kovar tevî nivîsên xwe, bi rengîniya wêneyên xwe jî balê dikişîne. Çend mijarên nivîsên di vê hejmarê de, wiha ne: ji Şîrnexê li ser xwarînekê, ji Erxeniyê li ser stranên şîrî, ji Mêrdînê li ser qewlêrkan, ji Gurgum û Semsûrê li ser duayên li ser navê xwedê tîn gotin, ji Farqînê li ser destana Siyabend û Xecê, li ser toponomiya gundekî Şîrnexê, ana-

lîza Leyla û Mecnûn... Her wiha nivîseke bi soranî ya latînzekirî jî di kovarê de heye.

Zargotin beşeke sereke ye

Edîtorê kovara Folklorame Eşref Keydanî, tîkildarî kar û xebatên kovara Folklorame axivî. Keydanî despêkê der barê dirûşma kovarê de axivî û diyar kir ku wan vê dirûşmê jî gotinên pêşyan 'bav pişt e, dê her tişt e' dariştîye û hîmê kovarê li ser vê ava kiriye. Keydanî bal kişand ser tîgehên zargotin û folklorê jî. Wî got ku her çend li şûna hev werin bikaranîn jî, ev her du tîgeh jî hev cihê ne û wiha domand: "Zargotin beşeke

folklorê ye. Li gorî zanyarên li ser folklorê xebitîne, gelek beşên folklorê hene. Her zanyar li gorî xwe sîmulasyonek çêkiriye. Di hemûyan de jî zargotin beşeke sereke ye. Wexta meriv li bêjenasiya wê dinîhêre, zargotin ew tişt in ku bi zîmanê meriv neqil dibin: gotinên pêşyan, biwêj, çîrok, destan û hwd. Lê di folklorê de xwarin û vexwarin, jiyana gundewar, bawerî, rêûresm, şîr û şahî, îdanî, xwedîkirina sewalan û hwd. hene."

Mal kaniyên folklorê ne

Eşref Keydanî destnîşan kir ku li bakurê Kurdistanê jî aliyê berhevkarîya folklorê ve, hişyariyeke baş heye û li herêmên cuda gelek kesên li ser folklorê dixebitin hene. Keydanî got ku di her hejmarê kovarê de, 7-8 nivîskarên nû hene û jî Şemzînan, Agirî, Meletî, Stenbol, Wan, Amedê û li gelek deverên din ên Kurdistanê berhevkarên folklorê xebatên xwe jî wan re dişînin. Wî diyar kir ku cihê du kurd lê hebin, li wir folklor heye û wiha axivî: "Ji aliyê berhevkarîyê ve sinorên me tune ne. Malên kurdan wek kaniyên folklorê ne loma jî herêm an jî sinorekî me yê diyarkirî tune ye. Em dibêjin folklorê Kurdistanê û ya kurdan."

Wêneyê gundekî jî girîng e

Edîtor Keydanî bi lêv kir ku kovara Folklorame jî aliyê dîtbarî ve jî gelek dewlemend e û li gorî wî bi qasî nivîsan, wêneyê jî girîng in ji bo



folklorê. Loma jî di her hejmarê de tenê ne nivîs, her wiha cih didin wêneyên zarbêj, şîrwar û deverên berhevkarî li wan hatiye kirin. Keydanî der barê vê mijarê de ev tişt got: "Bandora herêmê, bandora çem, gund û robaran li ser zarbêjan zehf e. Evana jî parçeyên folklorê ne. Folklor tiştê tenê bi devî tê neqilîkirin nîn e. Wêneyê gundekî jî, ji bo folklorê girîng e."

Em piştî nebjîn ax û wax

Di dawîya axaftina xwe de Keydanî bang li kesên ku kar û xebatên folklorê dikin an jî dixwazin vî karî bikin kir û got bila ew guh bidin kal û pîr û dê û bavê xwe û dengê wan tomar bikin. Keydanî axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Folklorê me bîngeha neteweya me ye. Hîmê netewebûnê di folklorê me da veşartî ye. Qodên me yê civakî, neteweyî hemû di nav wê folklorê de ne. Kî li ku be, bila berhevkarîyê bike. Ji bo ku em deh salên din nebjîn ax û wax, divê em vî karî niha bikin. Em bi rehetî dikarin wê tomar bikin; heger em nekin wê di nav dest û lepan de bimire, biçe. Em dikarin folklorê xwe bikin milêkê neteweya xwe."

Hejmarê nû ya kovara Folklorame bi naverokeke dewlemend gihîşt xwîneran. Edîtorê kovarê Eşref Keydanî got di demên dawî de eleqeya ji bo berhevkarîya folklorê zêde dibe û cihê du kurd lê hebin, li wir folklor heye



Pirtûka newayên ji bo piyano û kemanê

Akademiya Ma Muzîkê, haziriya pirtûkeke kurdî dîke. Pirtûk wê bi minasebeta projeya "Ji lorîkan ber bi senfoniyan rêwitiya newayan" çap bibe û taybetiya wê ew e ji bo fêrbûna keman û piyanoyê metodên kurdî dihewîne.

Koordinatîtorê Akademiya Ma Muzîkê Şêrko Kanîwar der heqê projeyê de jî nûçegihanên MA'yê Fahrettîn Kiliç - Fethî Balamman re axivî. Şêrko Kanîwar wiha got: "Taybetmendiyê van metodan heye, di cihanê û dîroka muzîka kurdî de cara yekem bi newayên kurdî jî bo piyano û kemanê wê metod bînan hazîrkirin. Niha me bi dest amadekariya projeyê kirîye. Muzîkjenê kurd Brûsk Zanganeh jî Swêdê bi telekonferansê beş-

darî amadekariyan dibe. Piyanîstê Bolîvyayî Sergio Escalera ku ev çar sal in em bi hev re dixebitin, jî Portekîzê bi telekonferansê tevî dibe. Ji Ma Muzîkê jî ez û Mamoste Ramîn tevî dibin. Heftêyê carekê bi awayekî sistematîk em bi telekonferansê civînên xwe li dar dixin. Em difikirin ku di meha mijdarê de pirtûka me çapkirî û li hemû sazî û dezgehên ku karê muzîka kurdî dikin belav bikin."

Kanîwar, da zanîn ku bi giştî 11 kes di projeyê de cih digirin û wiha axivî: "Hinek tenê nota dinivîsin, hinek heval stran hildibijêrin.

Wê hinek kes mîzanpajê bikin. Werger dê werin kirin. Zîmanê pirtûkê bi zaravayê kurmancî ye. Tekstên wê dê bi kurmancî



bin lê melodî wê bi zazakî, soranî û kurmancî bin. Hejmarê stranê hêj nediyar e. Rast e, stranên jî bo keman û piyanoyê hatine nivîsandin hene. Lê mixabin wek metod jî sedî sed kurdewar bin û jî nav newayên kurdî hatibin girtin, heta niha nehatine amadekirin. Ji bo wê jî ev berhem dê bibe yekem berhem û ew ê rê li pêş ciwanên nû

veke ku karibin van metodan dewlemendtir û xurtir bikin. An ku dê di asta cihanê de metodên fêrkirina piyano û kemanê bînan amadekirin."

Her wiha Kanîwar got ku ew dixwazin di çarçoveya vê projeyê de konserekê jî çêbikin bes ji ber şewba vîrusa koronayê dibe ku çênebe û projeya xwe li ser platformên dijîtal parve bikin. AMED



Temase bi dijîtal derket

Hejmarê yekemîn a kovara sînemaya kurdî Temase, gihîşt ber destê xwîneran. Kovarê de sê mehan carekê bê weşandin. Tevahiya wê jî li ser malpera wê ya internetê bi awayê PDF'ê dikare bê peyda kirin.

Xwedî û berpirsiyarên kovarê Mehmed Beyto û Cihan Ulûs in. Di kovarê de nivîsên li ser sînemaya dinyayê jî wê hebin. Tîkildarî sînemaya kurdî, rêûresma kurdî, xak, zîman û çanda kurdan wê pêşniyaz û rexne jî hebin.

Ji destpêka sînemayê heta sînemaya ewil a Amerîkayê, sînemaya Hollywoodê, pêlên nû yê sînemayê, sînemayên neteweyî û her wekî din sînemaya serbixwe û ya aktuel jî di kovarê de cih digirin. Bi van sernavan Kovara Temaseyê dikeve bin barekî giran.

Ji bo destpêkê û hejmarê yekê, mijarên li gorî wê derketine pêş; nivîsên li ser destpêka sînemayê û destpêka sînemaya kurdî hene, paşê jî mijarên roja me serpêhatiyêke biçûk û rewşa Netfîksê, wekî gelek cureyan mîzaha di nav sînemayê de hatiye nixandin. AMED



Hejmarê nû ya Zendê

Kovara lêkolîn û zanîstî Zend cara 27'an gihîşt xwînerên xwe.

Zend, weşana Enstîtûya Kurdî ya Stenbolê ye (Navê wê yê niha; Komeleya Lêkolînên Kurdî) ye. Kovar bi naverokeke nû çap bû. Di vê hejmarê de Tahir Baykuşak li ser "Rola Hacî Qadirê Koyî di Avakirina Fikra Neteweperwerîya kurdî de" nivîsiye.

Nivîseke din a li ser şexsiyetên dîroka yê kurd jî ya Olga Mixailovna Dîmîtriyeva ye. Dîmîtriyeva bi sernavê "Xebatên Mele Mehmûdê Bazîdî Wekî Çavkanîya Serdema Navîn a Dîroka Kurdan" nivîsa xwe pêşkêş kirîye ku Umîd Demîrhan ew jî rusî wergerandiye.


Yek jî nivîsên li ser şexsiyetan jî ya Rizgar Cebârî ye ku wî bi sernavê "Pûr Fereydûn: Şaîrekî Dêrînî Kurd" nivîsa xwe pêşkêş kirîye. Ji nivîsên li ser zîman Zana Farqînî meseleya "Gireya /-eve/yê û Erkên di Wê" girtîye dest. Berat Qewîndam bi nivîsa "Şewpnameya Kurmancî: Şewqeke Nû di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de" di kovarê de cih girtiye.

Şemoyê Memê nivîsa "Teyr û Balinde di Mîtolojî û Zargotina Kurdî de", Arîmed Delavî nivîsa "Temsîla Dewleta Tirk di Sînemayê de bi Rêya Zîmanê Bedenê" û Eli Paksîrîşt jî bi nivîsa "Gelo Pehlewîya Eşkanî Heman Kurdiya Navîn e?" cih girtiye. Du nivîsên din ên hatine weşandin jî ev in: M.Dandamayev & I.Medvedskaya, "Dîroka Medyayê", Eyyub Subaşî, "Bîbliyografîya Deh Hejmarên Dawî yê Zendê". STENBOL

Welatê Antîakosê zîrek: Komagene⁶

Keştiya Alalû

Agît Yazar



...Kêşana me ya tumulusa Qere-qûşê, pira Cenderê û kela Kextayê saet di 5'ê êvarê de qediyabû. Ji bo em vegerin pansiyona xwe ya li gundê binetara çiyayê Bêlê/Nemrûdê, em li ser riya Arsemyayê ya havîngeha Komageneyê re derbas dibin. Rîyeke din ji heye lê em dixwazin di ser Arsemyayê re derbas bibin. Lewra li gorî tê zanîn, hemû pilansaziya çekirina peyker û tirba birdariyê ya çiyayê Nemrûdê, li Arsemyayê hatiye çekirin. Loma ji ez meraq dikim her carê hoste Zozi-mos û şagirtên xwe bê ka bi çî awayî, ji Arsemyayê bi nabêna 15-20 kmî bi çiyayê Bêlê ve rapelîkîne, çûne û hatine.

Wexta em di kêleka Arsemyayê re derbas bûn, rulyefa qral Antîakos û Herakles li berpâlê, di nav dar û deviyên darên berû û mazî de ji me ve dixwuya. Esaleta darên berû û mazyê, ji ihtîşama qral Antîakos ne kêmtir bû.

Di nav xeyalên mijike di rengê şîrkî de, em bi çiyê ve radipelîkin. Dar û berên wê newalê, şahidên van gotinên min in. Dengê reqereqa simên hespan, li vîyalî û wîyalî newlê olan dide. Ewan hespan di nav moraneke razemend de, di xwêdanê de kamêt bûbûn û bi diranên xwe yên nola ferşan, gemên xwe di devê xwe de dikojtin. Û siwarên li ser piştê wan, siwarên tevhişkîşandî, atletîk û qemerî!

Tomofîla me nola min hişyar bike, nuqurçikan dide xwe û xwe dide kêleka rê. Li ser vê yekê ez ji bi xwe dihesim. Hesp û hêstîrên rêsi lêbarkirî ji jor ber bi jêr ve di-meşyan. Ez jiyana xeyalî û ya rasteqîn li nav hev dixînim û ez têgihîştina demê wenda dikim. Li min wisa eyan dihat ku ew gundi-yên ji dirûna rêsiyan vedigerian, ew hoste Zozi-mos û şagirtên xwe ne û ji çiyayê Nemrûdê vedigerin diçin Arsemyayê. Dîtin û gotina vê kêlîkê nabin yek...

Bi van niv-xeyal û niv-rastiyan, em derdikevin ser çiyayê Bêlê, angoyê çiyayê Nemrûdê. Ji bo pêşwazîkirina rojhilata siba tê, me xwest em tembî-qateke piçûk çêbikin. Lê hîn jî tam ne diyar e ka ew ê rayedarê destûrê bidin em li rojhilat temaşe bikin ana. Lewra min berê jî qal kiribû, wezareta eleqedar, ji ber nexweşiya koronayê, temaşekerina rojhilat û rojava li ser çiyayê Nemrûdê qedexe kiribû. Tîştê ji me re hatibû gotin, di rojên asayî de bi hezaran mirov derdikevin ser lût-



keya çiyayê Bêlê/Nemrûdê û sêra hilatîna rojê dikin.

Diviyabû îro heta êvarê, rayedarê muzexaneyê Semsûrê, cewabek bida me. Lewra bi navbênkariya dostê hêja nivîskar Mehmet Oncu, erca me di wî rayedarê muzexaneyê de dibuhurî. Em hêvî dikin ku erca rayedar ji di no-bedarên Nemrûdê de bibuhure û di berbanga sibehê de, em bigihêjin mexseda xwe.

Bi qasî kilometryekê tesîseke mezin hîna nû li jêra tumulusa Nemrûdê hatiye avakirin. Em dadigerin tesîsê. Tezgehdarkê me pêşwazî dike. Tezgehdarkê min û we ye gewre, edetî devê me girê dide. Hema ew dibêje çî, em dibêjin hi'hi, hi'hi' û em erê dikin. Ti nemaye me bişêlîne. Heta hindîk mabû lawîkê lî-cêyî, Mehemedê qamereman ji bi-hata xapandin. Mehemedê min û we jî, guhê wî dilîvin; edetî dikare mû ji mar bike û nehêle bi xwe jî bihese. De vêca hesab li ba we ye, bê tez-gahdar çîqasî "îpsîz e"

Hasilî kalam ez serê we neşînim (ku serê we êşiya jî, paçîkekî lê bigerînin) me xwe firtê firtê ji nav lepê tez-gahdarê gewre filitand. Ne hedê wî bû ku bikarîbûya bi lawîkê lîcêyî, Mehemedê qamereman re kaba xwe bavêta(!)

Heta me xwe gihand pansiyona xwe, ji birçîna zîkê me bi piştê me ve zeliqî bû; ew sibe û ev çax, em li ser zenga diranan bûn. Lê axirê bêje hema xwedê kir, firina xwe-diyê pansiyona em lê diman hebû û hevalan du saet berê xebard dabû xwediyê pansiyonê, da ku tîrşîkek li ber goşt, ji me re bavêje firinê.

Heta me dev û rûyê xwe şuşt, aspêjê firinê gazî me kir û got werin xwarin amade ye.

Li pêşiya firinê, zir-darek tûyê hebû û me yê li bin siya wê darê, xwarin bixwara. Beroşa qermîtîkî a tîrşîkê, li ser maseya tekerê qabloya ptt'ê danîbûn. Em li dora maseya xwe ya girover rûniştin. Xwarina di vê beroşê de, zû zû sar nabe; hîn jî tîrşîka me ya di beroşa qermîtîkî de, nola magmaya volqanîk peqok vedita û dikeliya.

Piştî xwarinê, em ji aspêjê re dibêjin: divê tu heqê firax-şuştinê ji heqê xwarinê bikujî. Aspêjê gewre tederdixê ku ev îronî, wesifdayîna xwarina wî ya ekildar e û me binê beroşê alatiye. Loma ew jî bi tiqetişî, di bin simbêlan de dikene û tiştêkî din nabêje. Aspêjê min û we radihêle bêrê di bin maxmaxa agirê firinê de dike, tîne wê tirafa ji darên berû û mazyê, valayî manqilê dike û ji bo çekirina çayê, qero dixîne xwêdanê.

Roj li ber avayê, lê hîn jî rayedarê muzexaneyê li me negeriyaye. Ji hêlekê ve ez çaya xwe kurr dikim û ji hêlekê ve jî telefîna xwe di nav destê xwe de dibim û tînim. Heçko li min eyan hatiye ku em ê mizgîna xêrê ji devê rayedarê muzexaneyê nebihîzin. Loma jî ez naxwazim piştî xwarinê û çayê efsanewî, tehma devê xwe xerab bikim.

Piştî qedeha nizanîm a çendemî, ez li rayedarê muzaxanê digerin. Bi dengêkî sist ez bersivandim û tehma devê min tahl kir.

Wekî din kî ma kî nema! Hah! Ji nişka ve dostekî min ê li Stenbolê tê bîra min. Ji hazira ne çêrir be, merivekî pirr baş e. Jixwe berê jî wî camêrî ji min re gotibû, riya te bi wan aliyan ket, haya min jê bike. Hema ez radîbîm tavîlkê li wî digerin û merema xwe jê re dibêjim. Ew jî hemû daxwaziya min li ser serê xwe qebûl dike û dibêje: ez ê merivekî bişînim ba te, navê wî filankes e. Ew bixwe nobedarê li ber peykerên çiyayê Nemrûdê ye. Bi awayekî sernuxumandî û perdekîrî tiştêkî ji min re dibêje.

Ez jî gotinê wî yên binbirex tedi-gihêjim ku ew merivê were ba me, qurucî ye. Ez di dilê xwe de dibêjim, bavo bila îşê me biçe serî, tu hez dike bila qesasê bavê min be!

Cara duduyan, kela çayê li qero-yê xwêdanayî dike. Di wê hênê de, ew zîlamê em li bendê bû ew jî tê. Min wa texmîn dikir ku ew mirovê em li bendê ne, yekî reş î qertîşî ye; neuzûbîleh tewqê cehnîmê li ser rûya ye. Lê na! Ez li xwe mikur werim, tam kesekî belaeîksî vê texmîna min bû; xortekî tîtal î qeşeng bû, her wiha zarşîrin û bi siyanet bû. Ji bo ku ez di

derheqê wî de wanî neyênî fikirîbûm, ez xwe bi xwe li ber xwe dikevîm. Ê ma ez rebenê xwedê çî zanim! Heta niha min çiqas kesên qurucî ditîbûn, tevdeken wan li gorî vê terfîa min a li jorê bûn...

Hasilî kalam, her çiqas ev xortekî qurucî bi sidqê sadiq li gel vê daxwaza me bû jî. Lê hevalên wî yên din bi gura wî nekîrin. Û mexseda me neçû serî.

Min pirr li ber canê xwe dabû ku em gera xwe ya li welatê Antîakosê zîrek Komageneyê, li ser textê yezdanan bi bernameyêke zûzû neyê jîbirîrin, wekî bernameya finalê tacîdar bikin. Lê mixabin ev ji me re neserifî.

Rayedaran got, kafîr kuştîye encax di navbera saet dehê sibê û heftê êvarê de, hûn ê bikarîbin li ser lûtkeya Nemrûdê bimînin.

Piştî ewqas hewldan, dewla me bi avê nakeve; em li ber sîngê xwe mexel tî. Û ji bo dema destîşankirî, em xwe ji sîbê re hazîr dikin.

Wekî serencam: ev serê 2 hezar û 56 salan e di ser wefata qral Antîakosê gewre re derbas bûye. Lê hîn û hîn jî, ev qral û dahênerê bawerîya ku hîn navek li wê bawerîyê nehatiye kirin, pizîka serê zîmanê cîhana arkeolojiyê ye. Her wiha miraqî ku meriv kuruderî dike û pîrsên bê bersiv, yên ku mejiyê meriv dikeritîne ew e: gelo tirba birdariyê ya qral Antîakos a di binê tumulusê de, tîrbek çawa ye??? (Dawî)



Derketina ser textê yezdanan

Tu yê sond bixwî yê derdikeve ser çiyayê Nemrûdê, ne ez, qral Antîakos bixwe ye. Rapelikîna bi vî çiyayê razmend, ew çend meriv qure dike, meriv dibêje qey ew mêr derketîye asta qralan. De ka, ev çîya merivekî ji rêzê wanî serî lê mezin bike, ma qralê çiyayek daniye ser çiyayekî û bi dehan peyker û rulyefên xwêda û xwedawendan li dorê çikandine, ew ê çawa xwe dernexîne dereceya yezdanan!?

Kelecana min ne kêmtî kelecana arkeologên Alman yê bi navê Otto Puchstein û Karl Sester bû. Van kesan, têtê ji Almanyayê di sala 1882'an de didin rê, tîne dibêjin tir, tir, tir û derdikevin ser vî çiyayê razemend. Û çaxa çav li peykerên yezdanan ên dêwasa dikevin, devê wan ji hev diçin û tê digihêjin heta belîka guhên wan.

Bêlê. Di taliyê de ez derdikevim ser çiyayê Nemrûdê û her pênc yezdan; Antiochos-Theos, Fortunatike-Komagene.

Zeus-Orosmasdes-Ahûrta Mazda, Apollon-Mithras-Helios-Hermes, Artagnes-Herakles-Ares, her wiha şêr û teyrê homandêr yên hukumdariya Komageneyê, min pêşwazî dikin.

Yek ji wan pênc yezdanan jin e û navê wê xwedawenda Komageneyê ye. Taceguleke ji hemû mêwê û fêkiyên xwedê, li serê wê ye. Û ev xwedawenda jin, di heman demê de xwedawenda homandêr (koruyucu) a şahîşaha Komageneyê ye. Her wiha, navê wê daye şahîşahê û kiryê Komagene. Gelek lêkoler dibêjin, ji ber ku di alfabe ya grekî de tîpa "j" tune ye loma li şûna tîpa "j" tîpa "g" hatiye bikaranîn. Li gorî xedawenda şahîşahê ya homandêr jin e. Gelekî bi mantiq e ku ev nav ne Koma(g)enê, Koma(j)inê be. (Bêguman ev yek motaja piştirastkirinê ye)

Cara ewil ez çav li tumulusa ji şujuk û kevîrê hûr pêkhatî dikêvim, ez wê dibîbînim taca li serê qral Antîakosê 1. Meriv dibêje qey qral Antîakos, taca serê xwe ya îlûçî daniye ser serê çiyayê Bêlê.

Tê texmînkirin ku ev tumulusê gewre, di destpêkê de nêzî 100 metreyî bilind bûye. Lê niha tibabekî mehîyaye û tenê maye 50 metre.

Welatê yezdanan ê hevpar: Komagene

Qral Antîakosê 1. piştî bi hemû hukumdarên cîranên xwe re peyman aştîyê girê dide, êdî pêdikeve dest bi avakirina perestîneke navendî dike. Heke meriv rewşa bawerîyên hingê bîne ber çavan, wê çaxê meriv ê heq bide qral Antîakos ku bi avakirina navendek wek a çiyayê Nemrûdê û her wiha senteza bawerîya rojhilat û rojava, tiştêkî gelekî serkeftî pêk anîye.

Jixwe di bawerîya mîtraîzm û ya Zerdestî de, roj

remza herî pîroz a xwedayî bûye. Loma qral Antîakos, perestgehê li ser çiyayekî were ava dike, çaxa roj hiltê û diçê ava, e'edetî tumulusa Nemrûdê silav dike û di nêzîkî wî re derbas dibe diçê.

Meriv dikare bibêje, ne bawermendên mîtra, ne yên Zerdestî û ne jî yên Apollo-Zeûs, bi qasî qral Antîakos navendek wanî herkesî bihimbêzîne, ava nekîrine. Qral Antîakos gotiye: madem roj ev çend pîroz e, nexwe divê ez perestgehê li nêzî wê ava

bikim û hemû yezdanên cîhana rojhilat û rojava bînim li wir biçînim. Û qral Antîakos wer jî kiriyê. Welatê xwe Komagene, kiriyê navenda civîna yezdanan. Û li ser xelkê xwe ferz kiriyê, salê du caran derkevin ser textê yezdanan û nola hecê wê bitawafînin. Her wiha Antîakos di Nomos (ayet/peyman) ên xwe yên pîroz de nivîsandiye, gotiye: di roja tewafkirinê de, divê keşişên peywardar, xwarin û vexwarinên xweş ji tewafkaran re pêşkêş bikin.

Di destpêkê de îlankirina vê bawerîyê, pir xweş çihê xwe digire. Lê bêsiidîya herî mezin ew e ku, piştî îlankirina bawerîya Antîakosî 40-50 sal şûn ve, bi pêşengîya asûran, bawerîyêke bi navê xiristiyanîyê tê belavkirin. Bi belavbûna ola xiristiyanîyê re, bawerîya Antîakos xwe li ser piya nagire û di gel welatê wî Komagene, bawerîya wî jî hildiweşe û di nav rûpelên dîroka tozgirtî de tê binaxkirin.